K.T.
Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Mastira Bêtez

# LI HEREMA KERBORAN LÊKOLÎNEK LI SER KULTA MEŞEYÎXEKE JIN: ŞÊX MOMINA MIRADA

Eyüp ÇELİK
20721011

Şêwirmend
Doç. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn 2022

## NAVEROK


**Pêşgotin**
**Kurte**
**DESTPÊK**
Mijar
Armanc
Rêbaz
Çavkanî

1- **BEŞA YEKEM: TESEWUF, WELÎTÎ, KERAMET, ZÊW**
  1.1. Tesewwuf Çîye? Dîroka Tesewwufê
  1.2. Welîtî Çîye? Avabûna Kulta Welîtîyê?
  1.3. Têgeha Keramet û Menqebe Di Tesewwufê De?
  1.4. Di Nav Kurdan De Zêw

2- **BEŞA DUYEM: CUDAHÎYÊN ÎSLAMA KURDAN Û DI ÎSLAMÊ DE CIHÊ JINAN**
  2.1. Îslama Gel (Folk) û Cudahîyên Îslama Kurdan
  2.2. Di Dîroka Îslamê De Cihê Jinan
  2.3. Di Dîroka Tesewwufê De Rola Jinan
  2.4. Jinên Kurd ê Alim û Sofî ên Navdar

3- **BEŞA SEYEM: ŞÊX MOMINA MIRADA Û KULTA WÊ**
  3.1. Çîroka Welîbûna Şêx Momina Mirada
  3.2. Dahûrandina Motîfên Çîroka Welîbûna Şêx Momina Mirada
    3.2.1. Motîfa Jinbavîyê
    3.2.2. Motîfa Bûyîna Çûk Yan Ji Kevokê
    3.2.3. Motîfa Avdana Pezkovîyan
    3.2.4. Di Kela Zivistanê De Derxistina Fêkîyên Havînê
    3.2.5. Motîfa Fêmkirina Armanc û Ramanan
    3.2.6. Motîfa Rihbirînê Bi Kêran
  3.3. Wek Ezîzeyeke (Saint/Qedîşto) Mesîhî Şêx Momina Mirada
    3.3.1. Delîlên Dîrokî
    3.3.2. Delîlên Çîrokî

**ENCAM**

**PÊVEK:**

Pêvek 1: Wêneyên Gund û Meşayîxê Şêx Momina Mirada

## PÊŞGOTIN

Welî û meşayîx ew kes in ku tê bawerkirin hêzeka wan a Xwedayî heye û cih û warê wan ji alîyê gel ve pîroz tê qebûl kirin. Di mekanê wan de kesên hewcedar daxwaz û mirazê xwe tînin ziman, dua tên kirin û li gor derfetên hewcedaran ajal tên serjêkirin. Ev welî û meşayîx ji bo bîra kolektîf û hevdûgirtina civakê fonksîyonên cuda, gıring tînin cih. Her ciqasî îro di nava civakê ev bawerîyên li ser welî û meşayîxan li beramberî pêşketina cîhanê wek sedema paşmayînê bên dîtin jî, bawerîya bi wan kêm nebûye û wek berê erkên girîng û tekel tînin cih.

Li cihanê û bi giştî jî li rojhilata navîn jinên pîroz, welî û ezîze li gor mêran kêm in. Di bawerîya Îslamê de li gor bawerîyê din jinê pîroz û welî hê kêmtir in. Şêx Momina Miradan li herema Kerboranê ewqas meşayîxêke navdare ku ji biçûkayî ve ez bi çîroka wê mezin bûm. Bi hişê zarokatîyê ev pirs diket serê min: Çawa çêdibe ku jinek wek meşayîx û welî hatîye pejirandin, derdor û cîran hewara xwe digihînine? Dema ku min li lîteraturê nêrî, min dît ku li cîhanê û di nav kurdan de jinên pîroz kêm in lewma lêkolînê li ser wan jî hê kêmtir in. Ji ber vê rastîyê, me jî berhevkirin, bawerî û rîtûelên têkildarî Şêx Momina Miradan li herema Xelîla (gundê Kerboran) weke mijara vê xebatê hilbijart. Digel hemû astengî û kêmçavkanîyan, di qada vê xebatê de em hêvî dikin ku lêkolînên weha zêde bibin û taybetmendî û cudahîyên folklora kurdan ji nêz ve bêhtir bê naskirin.

Di pêkhatina vê lêkolînê de alîkarî û keda gelek kesên hêja çêbûye. Di serî de spasîya mezin ji şêwirmendê xwe Doç. Dr. Mustafa Aslan re dikim. Bi şîret, pêşnîyarî, tecrûbe, sebr û alîkarxwazîya xwe di gel min bû û lêkolîn li ber min hêsan kir. Hevjîna min Esra ez teşwîq kirim û sebr kir, spasdariya wê dikim. Rêvebira Pirtûkxaneya Gel a Wanê Aysun Xanimê ji bo wext û mekan derfet da min, spasîya wê dikim. Mal ava Pîskopos Gabrîyel Akyüz bi agahîyên xwe ez ronî kirim ji cenabê wî re spas dikim.

**KURTE**

Di vê xebatê de di serî de têgehên wek tesewwuf, welî, keramet, menqebe û zêw hatin danasandin. Cudahîyên Îslama kurdan ji îslama cîranên wan hatine nîşankirin, di tesewwufê de rola jinan hatîye ravekirin û jinên alim û zahid ên kurd bi kurtayî danasîna wan hatîye kirin. Di beşa dawî de wek jineke meşayîx, welî û pîroz Şêx Momina Miradan li gor agahîyên çanda devkî çîroka wê bi varyantên cuda hatiye berhevkirin, motîfê di menqebeya wê de hatine analîz kirin. Bi kurtayî dîroka heremê hatîye danasandin û tevî motîfên di çîroka wê de angaşta ku bi eslê xwe ew ezîzeyeke (qedîşto) Sûryanî ye bi daneyên girîng hatîye vegotin û dahurandin. Weke rêbaz, çanda devkî hatîye bikaranîn û bi çavkanîyên nivîskî ev daneyên ku hatin berhevkirin hatine şîrovekerin. Herwiha hatîye dîtin ku kulta vê jinê ji alîyê misilmanan ve hatîye guherandin û temelûk kirin.

**Peyvên Sereke:** Tesewwuf, Zêw, Welî, Jin, Meşayîx, Ezîze, Kult, Motîf, Temelûk Kirin.

## DESTPÊK

Di nav gelê rojhilatî de kulta welî/ewlîya, qenc û dostê Xwedê gelek in û pîrozmendîya wan bi gelemperî piştî mirina wan geştir dibe û didome. Ji bo yê ku bawer dikin ev welî û dostê Xwedê di kêlîkê zehmet de, bi şêweyeke derasayî tên alîkarîya bawermendan û wan ji zext û zorê xelas dikin. Hêzên wan ên derasayî li gor şert, merc û daxwazê xwecihîyên heremê tên afirandin. Zîyaretên van qencê Xwedê ku piştî mirina wan bi gelemperî wek meşayîx tên binavkirin, di nav civakê de hevrebûn û domandina kevneşopîyan xurt û qewîn dikin.

Li welatê kurdan meşayîx, welî, zîyaret û hwd. fenomenên nav-olî ne. Çi misilman, çi mesîhî, çi elewî û hwd. bin; ev fenomen hevpar in û di jiyana rojane de çanda bawermendên van olan tesîra xwe ji wan digirin. Zîyareta Şêx Momina Mirada di panteona welîyên kurdan de zîyaretek e taybet e. Sedema taybetbûna wê wekî jineke ji rêzê keramet nîşandane û tevî ku jine û bi vê zayenda madun hatîye qebûl kirin di heman demê de ji ezîzetîye bûye welîya Xwedê yanî hatiye temelûk kirin jî. Keramet û sirrê wê li heremê wek çîrok û efsaneyan ji hûr û giran re tê gotin û her 15ê tebaxê zêwa vê jinê bi awayeke coş û qelebalix tê pîrozkirin. Wek ezîzeyeke mesîhî mirîye û îro jî wek welîyeke misilman şîfayê dide diaker û alîkarxwazê xwe. Her çiqasî dinya biguhere jî kulta vê meşayîxê hêjî zindî ye û di vê xebatê de em dê qebûl kirin û zindîmayîna kulta vê meşayîxê vekolin.

### Mijar

Di rojhilata navîn de gelek dîn derketine holê, berbalavbûne lê di bin bandora çand û kevneşopîyê de kêm zêde rewşa jinan eynî maye. Lewra di nav civakên îslamê de jî welî, alim, şêx û serok ê jin kêm in. Gelek sedemê vê yekê hene. Îslama kitêbî û sinnî (ortodoks) bi şêweyeke ‘kêmaqil’ û ‘bindestane’ li jinan dinêre. Di dînê Îslamê de ji xeynî ehlî beyt (keç û jinên pêxember) û çend jinên navdar ên wek Rabîa el Edewîye, Muaza el Edewîye ku di asta mêran de tên qebûlkirin, jinê (nîv)pîroz gelekî kêm in. Helbet meşayîxê jin jî gelekî kêm in û herwiha ji bo kurdan jî ev îdia derbasdar e. Tevlî vê hindikahîya alim û welîyê jin, mijara me ya sereke wek meşayîxeke jin *kulta Şêx Momina Mirada* ye.

### Armanc

Heta van demê dawîyê di warê lêkolînêrîya kurdolojîyê de tiştê biçûk, bidetay û ‘bêqîmet’ dihatin piştguhkirin an jî taloq kirin. Li welatê kurdan û di nav cîranên wan de welîyê jin ku dema saxbûn kesê ji rêzê bûn; gelekî kêm in. Ev yek jî lêkolîna kulta vê meşayîxê balkêş dike. Armanca me lekolîna kulta vê meşayîxê ye ku rîtuel, bawerîyê gelê heremê û çîroka wê em tehlîl bikin. Çi welî çi jî ezîzeyeke mesîhî be, mebesta me ew e ku di nav civakeke patrîyarkal û sinnî de pejirandina kulta jineke ji rêzê ye ku hem jin hem jî mêrê heremê li dor kulta vê jinê xaleke pîroz avakirine. Bi kurtasî, wekî hemû xebatên ku li ser çand û zimanê civakên bîyanî hatin kirin, ji bo kurdan û kurdolojîyê jî xebatê ‘bêqîmet’ û biçûk pêwîst in û ev xebat jî di qada xwe de nimûneyeke pêşeng e û bêşik jî mitewazî ye.

## Rêbaz

Derbarê Şêx Momina Miradan de ti agahîyên fermî yan jî arşiv tune ne. Li gor niştecihên heremê Şêx Momina Mirada berîya 400-500 salî ji derveyî heremê hatîye û li wir bi cih bûye. Ji ber vê yekê xebat bi giştî ji neçarîyê xwe di siperê daneyên ku ji sehayê bi riya hevpeyvîn û çavdêrîyan hatin bidestxistin. Herwiha agahîyên ku derbarê Şêx Momina Miradan de bi metoda hevdîtinên çanda devkî hatine berhevkirin bi teoriyên li ser tesewwuf û bawerîyên heretîk yên sereke wê bên şîrove kirin.

## Astengî û Kêmasî

Wek hemû vekolînên civakî ev xebat jî di nava xwe de gelek astengî û kêmasîyan di hewîne. Kêmasîya herî mezin, di demên teng de ez derketim sehayê ku derfet ji min re çênebû ez çavderîyên berfireh bikim. Sedema ku ez li Wanê dijîm û dixebitîm encax di demê kin de ez derketim sehayê û hevpeyvîn bi niştecihên heremê re min kirin. Sehaya ku ez lê xebitîm jidayîkbûnê heta îro, 26 salê min lê derbas bûn. Hêvîya min ew e ku ev 26 salê min bibin telafîya astengîyên demkî. Herwiha astengîyeke din a vê xebatê jî di warê çavkanîyan de ye. Derbarê lêkolîna me de tu qeyd û belgeyên arşîvî tune bûn yan jî min bi dest nexistin. Di arşîvê Osmanî û mesîhîyan de derbarê kulta ve meşayîxê tiştek bi dest me neket. Ji neçarî me xwe sipart çavkanîyên devkî ku hêvî dikim cihê kêmasîyên bîblîyografîk hinekî jî be girtibin. Herwiha li erdnîgarîya me de jinê welî kêm in, lewma di lîteratura tirkî û kurdî de xebatên ku li ser kultên jinên welî û meşayîx hatin kirin jî gelekî kêm in û

ev rewş ji vê lêkolînê re bûye wek kêmasîyekî. Sedema van astengîyên girîng, lêkolîn di qada xwe de xebateke pêşeng e û herwiha bêşik mitewazî ye.

**Çavkanî**

Di beşa yekemîn û duyemîn de çavkanîyên bîblîyografîk; di beşa seyemîn de jî hem daneyê sehayê (ji devê gotarvanan wê bên veguhastin) hem jî çavkanîyên sereke û bîblîyografîk wê bên bikaranîn. Di xebatê de em ê hem çavkanîyên asta yekem hem jî ê asta duyem (agahîyên devkî) bikarbînin. Bikaranîna çavkanîyên devkî tercîheke rêbazî ye ku em encax bi saya van çavkanîyên devkî em bikarin nêrîn û bawerîyên xwecihên heremê fêm bikin. Tevî van agahîyên jorîn me xwe sipart van çavkanîyan:

Hevpeyvînên ku me bi kesên ji heremê re kirin: Bihara Xelîlî (58 salîye), Eyşa Xelîlî (64 salîye), Gozela Xelîlî (67 salîye), Menîca Helokê (83 salîye), Hemed Elîyê Mala Qaso (78 salîye), Mele Evdile Kurdî (52 salîye), Quryakos Ergün (52 salîye, Serokê Weqfa Dêr Emerê ye), Gabrîyel Akyüz (63 salîye, Rêvebirê Mor Behnamê ye), Elîyê Neso (85 salîye), Hemedê La'lê (73 salîye).

Çavkanîyên bîblîyografîk û teorîk ê ku bi piranî bên bikaranîn ev in: Berhemên Ahmet Yaşar Ocak ê bi navê *Kültür Tarihi Kaynağı Olarak Menâkıbnâmeler* û *Tasavvuf, Velayet ve Kainatın Görünmez Yöneticileri*; xebata Ahmet T. Karamustafa *Tasavvufun Oluşumu*, berhemên Mamoste Qedrî Yildirim *Kürt Medreseleri ve Alimleri* û *Kürt Kadını*, xebata Abdulhuseyn Zerrînkûb ya bi navê *Sûfî Mirasının Değeri, xebata* Mustafa Kara *Tasavvuf ve Tarikatlar* û *xebata* Süreyya Su *Hurafeler ve Mitler,* xebata Baba Merdoxê Rûhanî *Dîroka Navdarên Kurd.*

Ji bo vê xebatê em di beşa yekem de cih didin têgehên tesewwuf, welîtî, keramet û zêwên meşayîxan. Di beşa duyem de em dê behsa îslama gel (heretîk), cudahîyên îslama kurdan û behsa jinê kurd ê alim û sofî bikin. Beşa dawîyê beşa me ya esasîye ku di wir de em ê kulta Şêx Momina Miradan tehlîl û şîrove bikin û îdiayê xwe peşkeş bikin. Hem wek welîyekî hem jî wek ezîzeyeke (mort/saint) mesîhî em ê çîrok, kult û rîtuelên ku li derdora gorna wê tên kirin dahurînin û li gor agahîyên ku me bi dest xistin şîrove bikin.

# BEŞA YEKEM: TESEWWUF, WELÎTÎ, KERAMET Û ZÊW

Têgeha welî di bawerîyê monoteîst û pagan de giring e ku ev peyv bi gotinên cuda heman wateye dide: Saînt, hagîos, qeddîs, ezîz, mor û hwd. Gelek bawerîyên heretîk û pagan piştî derketin û pêşdaçûna îslamê tevlî bawerîya îslamê bûne û bi kirasê îslamî wekî pîroz hatine qebûl kirin. Lewma welîtî di dîroka îslamê de ne têgeheke nû ye; em bi nav û şêweyên cuda di nav bawerîyên rojhilata navîn de li rasta vê bûyerê tên. Herwiha piştî derketin û pêşdaçûna îslamê de bizava welîtîyê hêdî hedî hatîye qebûl kirin û resen bûye. Ev têgeh bi tesewwuf, keramet, menqibe û zewan ve têkildar e. Ji bo fêmkirina welîtîyê hewceye ku di serî de em van têgehan rave bikin.

## 1.1. Tesewwuf Çîye? Bi Kurtayî Dîroka Tesewufê

Tesewwuf di dîroka îslamê de têgeheke talî ye. Pispor û kesên ku li ser tesewufê berhem nivîsîne di heman fikrê de ne ku tesewuf di heyama piştî îslamê derketîye (Karamustafa, 2017, r. 3). Çêbûna têgeha tesewwufê, ji pêdivîya veqetandinê ye. Wek ku tê zanîn dînê îslamê li ser pênc şertê rîtuelî û şeş şertê îmanê avabûye. Kesê ku van rîtuelan pêk tînin wek misilman tên qebûlkirin ku ev bawermendîyeke *'ji rêzê'* ye. Lê sofîtî û tesewuf dî bawerîya dînê îslamê de asteke dî ye. Gava ku têgeha tesewufê tê bikaranin, jiyaneke mîstîk û nêrîneke batinî tê fêmkirin.

Her çiqasî li ser etîmolojîya peyva tesewufê nêrînên cuda hebin jî vekolerên vê bizavê bêhtir li ser du nêrînan hevpar dibin: Nêrîna yekemîn û xurt ev e ku peyva tesewufê koka xwe ji '*sof*'ê (ص و ف) digire ku tê wateya hirîyê û li ser vê bawerîyê ne ku sofîyên pêşî ji ber ku cil û bergên hirî lixwe kiribûne û lewma ev nav li wan hatîye kirin. Li gor nêrîna duyemîn, koka peyva tesefwufê ji '*safa*'yê (ص ف و) tê ku ev jî tê wateya arîtî û paqijbûnê (Lings, 1986, r. 51-3). Wekî din di nav vekoleran de nêrîna ku koka peyva tesewufê ji 'sophîa' ya yewnanî tê hatîye îdiakirin, lê ev îdia ji ber ku peyva sofîtîye hê ku felsefeya yewnanî di nav îslamê de belav ne bûbû derketîye holê îdiayeke qels û ne saxlem e (Öngören, 2009, r. 471-472). Sedema ku felsefe li têkilîyên di navbera mirov-hebûn-zanînê di nêre lê tesewwuf li têkilîyên di navbera Xwedê-mirov-hebûn-zanînê de nêre. Tesewwuf wek felsefeyê ne bi teşeyeke rasyonel lê bi keşf û îlhamê van têkilîyan şîrove dike. Lewma çavkanîya bêjeya tesewufê ji radera koka sofê hatîye.

Piştî mirina pêxember (k.d. 632) di serdema Ebbasîyan de li Besrayê di nav dînê îslamê de bizaveke ku ji zewq û şahîya civakî xwe dûr dihêle û dilê wê ji dinyayê sarmayî peyda bû. Van kesên ku ji şêwejiyana berbelav bi awayeke radîkal nefret dikirin; cil û bergê hirî li xwe dikirin, ji bawerîya xwe re zuhd û ji xwe re jî zahid digotin (Kara, 1992, r. 11). Van kesan dev ji kar û barê dinyayî berdabûn, bi kêm nan û kêm av; ji bo fêmkirina wateya batinî ya Qur'an û sinetê *('ilmûl batin)* jiyana xwe didomandin. Ji bo wan li vê dinyaya *zahir* tişta herî giring îstînbat[1] bû ku, ev têgihiştina mîstîk li herkesî ne di hesilî. Herwiha vê nêrînê piştî demeke ev yek da qebûl kirin kû têgihiştina mîstîk encax dayîna Xwedê ye. Kesên ku ji aliyê Xwedê ve wek dost û '*welî'* (pirjimara wê ewlîya) hatin bijartin ancax dikarîbûn bi van hêlên zanîn û têgihiştina Xwedayî fêm bikin. Ev nêrîn pêşî di nav şiîtîyê de peyda bû, paşê jî hêdî hêdî di nav sinnîtîyê de jî belav bû (Karamustafa, 2017, r. 7).

Peyva sofî heta sedsala 2/8an ji bo binavkirina kesên ku ji zewq û sefaya dinyayê nefret dikirin re dihat bikaranîn û ji ber vê yekê hat afirandin; ku van sofîyan cilê hirî li xwe dikirin û ji civakê dûr dijîn. Ji ber vê jî wan re sofî hatiye gotin, lewre hirî bi erebî sof e li gor vê jî kesên ku ev cilên hirî li xwe kirine bi erebî *sofî* ango kesên 'bi hirî' dihat gotin. Ji bo van sofîyan li dinyaya zahir tişta herî girîng, ji malê dinyayê dest û pî kişandin (zuhd), qezençkirin (kesb), nêzîkbûna Xwedê (qurb) û xwe sipartina Xwedê (tewekul) bû (Karamustafa, 2017, r. 13). Helbet di ber bikaranîna peyva sofîtîyê de tegêhên wek zahid, nasiq û 'abid jî dihatin gotin. Di sedsala 3/9an de peyva sofî êdî bi şêweyeke spesîfîk, ji bo tevgera avangard a dînî û civakî ya tesewufê hat bikaranîn. Êdî gava ku sofî dihat gotin, ne zahid û nasiq lê bêhtir kesên ku ji bizav û ekola tesewuffê bûn dihatin fêmkirin.

Tesewwuf di sedsala 4/10an de wek ekoleke girîng hat naskirin û qebûlkirin. Kesên wek Ebû Hemza el Bexdadî (k.d. 289/902), Ebû Seîd el Harraz (k.d. 286/899), Cineyd el Bexdadî (k.d. 298/910) û yên din bi fikr û ramanên xwe bingeha teorîk ya tesewufê danîn. Rîsaleyên di derbarê tesewufê de ên pêşî di vê serdemê de ji alîyê kesên wek Ebû Ebdullahê Tirmizî, Ebû Huseyîn en Nûrî, Ebû Seîd el Harraz ve hatin nivîsandin. Mektebeyên Bexda, Besra, Xoresan, Endilûs-Mexribê bizava tesewufê birêkûpêk kirin. Mihyeddîn Îbnûl Erebî (k.d. 638/1240), Ebû Ebdullahê Tirmîzî û

[1] Têgeheke metoda fiqihe ye. Ev peyv bi wateya rasterast tê wateya lêkolîn, bi dû ketin, bi encam xistin e. Bi wateya fiqihê tê wateya "ji nasê Qur'anê daraz derxistin" e (Koca, 2001, s. 368-9).

Şêx Şehabeddîn Suhrewerdî (k. d. 587/1191) di dîroka tesewufê de roleke gelekî girîng girtin. Piştî wan êdî tesewuf di nav misilmanan de resen bû, fikrên ku wan di derbarê tesewuf, welî, welayet û kerametê de îdia kirin bêşik hatine qebûl kirin û berbelav bûn (Ocak, 2021a, r. 110-72).

Vekolêrê tesewwufê bi piranî li ser sê teorîyan sekinî ne: Teorîya yekemîn dibeje ku tesewwuf koka xwe ji çand û bawerîyên berî û derveyî îslamê digire. Ev teorî bêhtir ji alîyê rojhilatzanan ve hatîye îdia kirin. Teorîya duyemîn, li hember teorîya yekemîn; bi piranî ji alîyê vekolerê misilman ve hatiye idîa kirin û dibeje koka tesewwufê di nav bawerî û dînê Îslamê de ye. Teorîya seyemîn van her du teoriyê pêşî qebûl dike. Bi hevre wan gire dide û îdia dike ku tesewwuf koka xwe hem ji çand û bawerîyên berî (cihûtî-xiristiyanî, zerdeştî, budîzm, helenîzm û hwd.) û derveyî (mewalî) îslamê digire hem jî bawerîya Îslamê bi xwe (Qur'an, sinet, hedîs) ji tesewwufê re bûye çavkanîyeke xurt (Ocak, 2021a, r. 35-98). Teorîya seyemîn ji ber ku ji alîyê sosyoloji û dîrokê ve pêwendîdar û rasteqîntir e nêzîktirî aqila ye.

### 1.2. Welîtî, Welayet Çîye? Avabûna Welîtîyê

Bêjeya welîtîyê di zimanê erebî **(وَلِىَ)** de ji lêkera nêzîkbûnê hatîye dariştin û di wateya nêzîkbûna di navbera tiştan yan jî kesan de tê bikaranîn. Herweha têgeha welîtîyê bi van wateya jî tê zanîn: dost, heval, alîkar, şirîk û hwd (Ocak, 1992, r. 1). Bêjeya ewlîya jî pirjimarîya welî ye.

Di lîteratûra îslamê de hedîs û ayetên ku ji welîtîyê re bibin bingeh gelek in. "Bizani be ku li cem Xwedê evdên wî yen ewqas nêzîk hene ku ne pexember ne jî şehîd in lê dîsa jî ji ber nêzbûna wan û Xwedê, pêxember û şehîd xwezîya xwe bi wan tînin. (…) Ew wê roja qiyametê dê li ser textêkî ji nûrê rûnin, rûyê wan wê tev bê nûr. (…) Ev kes, *welîyê* Xwedê ne".[2] Ev hedîsa ku hatî guhastin wek hedîsa '*xwezîbûnê*'tê zanîn ku di sedsala 2/8an de li derdoreke fireh dihat qebûlkirin. Di 87 ayetên Qur'anê de bêjeya welî/ewlîya derbas dibe ku ji van ayetan 46 di derbarê dostanîya Xwedê û kesan de ne (Çağrıcı, 1994, r. 511-3). Di nav hedîsan de gelek jî ne sehîh in lê di wextê avabûna kulta welayetê de cihekî giring girtine. Pejirandina bawerîya ku welî dostê Xwedê ne û ji alîyê Xwedê ve ji bo wezîfeyê taybet hatine bijartin hê di sedsalê 2/8an de destpêkirîye. Piştî mutesewufê mezin Tirmîzî, Şêx Şehabeddînê Suhrewerdî

[2] Hedîs, ji alîyê hedîszanê mezin Tirmizî û Ehmed b. Henbel ve hatîye veguhastin.

û Îbnûl Erebî ve bawerîyê cihê xwe di nav bawerîya gel û dîroka Îslamê de resen kiriye.

Her çiqasî welîtî di xebatên akademik de bi şêweyeke kompileks hatibe bikaranîn jî di bingeha civakî ya welîtîyê de fenomeneke hesan cih digire: *Xatir!* Kesên di saxîtîya xwe de wek alim û mutesewif tên naskirin piştî mirina wan, ew derbasî axretê dibin ku êdî ji alîyê gel ve nezîktirî Xwedê tên qebûl kirin. Ev meşayîx[3], welî, qenc û dostê Xwedê ji bo kesê daxwaz û hawarên xwe digihînan wan di navbera Xwedê û evdê wî de wek pêwendîyekî tên dîtin. Welîtî di vir de tê wateya nêzîkbûn û hîmaye kirin e. Welayet, nezîkbûna metafizik di navbera Xwedê û evdê wî de ye. Xatir bi wateya şefa'etê tê bikaranîn.

Di lîteratura şiîtîyê de welî ji nav ocaxa pêxember derdikevin, nevîyê Elî ne û ehlî-beyt in. Lê di lîteratura sinnîtîyê de kesê ji rêzê jî dikarin bibin welî û xweyî keramet. Di sîstematîzebûna welîtîyê de teşeyeke wek pîramîdê çebûye ku ev pergal wihaye: Di serê pîramîdê de Qutb heye ku ew li ser rûyê erdê nûnertîya hemû welîyan dike. Di bin qutb re nuqeba hene û du kes in. Di bin wan re evtad hene û çar kes in. Di bin wan re ebrar hene û heft kes in. Di bin wan re evdal hene û çil kes in. Di bin wan re jî exyar hene û ew jî sêsed kes in. Bi temamî ev 356 kes in û gava ku yek ji van welîyan wefat dike, yekî di bin wan re cihê ê ser xwe re digire. Ev welî li cîhanê belavbûyîne û tenê yê li ser, ê di bin xwe re nas dike û kesê ji rêzê û gel van welîyan nas nakin. Di lîtaretûra Şiîtîyê de jî welîyê Xwedê 12 kes in, îmamê dawîn ê duwanzdeha Mehdî ye û Sahîbu'z-Zeman e (Zerrînkûb, 2017, r. 107-8).

### 1.3. Keramet, Menqebe û Sirr

Di avabûna welîtîyê de têgeha herî girîng ya ji bo welîtîyê keramet e. Serborî, çêbûn û belavbûna kerametên welî ji bo gihandina pileya welîtîyê, tiştên herî qewîn û girîng in. Bêjeya menqebe, koka xwe ji peyva erebî "neqebe"yê **(نقب)** werdigire û pirjimarîya wê menaqib **(مناقب)** e. Wateya wê behskirin, karê baş, îsabetkirin e. Ev

[3] Pirjimara bêjeya şêx e. Lê wateya bêjeyê di kurdî de guherîye û ji bo nîşankirina goristanê ku welî di nav de hatin veşartin tê bikaranîn.

têgeh cara pêşî di sedsala 3/9an de di pirtûkê hedîsan de ji bo şiyan û fazîletên sehabeyan hatîye bikaranîn (Ocak, 1992, r. 27). Herwiha bêjeya “keramet” **(كرامت)** jî di wateya menqibe de tê bikaranîn û naveroka menqibeyan ji kerametên welîyan pêk tên.

Di heman deme de di nava gel de bêjeya “sirr” **(السرّ)** jî tê bikaranîn. Sirr di tesewwufê de di wateya ‘tişta ku tenê Xweda yan jî kêm mirov pê dizanin’ (Tosun, 2009, r. 115-6) de tê bikaranîn û di nava gel de ‘ger welî kerameta xwe eşkere bike, wê sirra wî pûç bibe’ tê bawer kirin. Di tesewwufê de rengê sirra welîyan kesk hatîye qebûl kirin û îro jî di nav goristanê meşayîxan de ala li ser gorna meşayîxan ji ber vê yekê kesk e û di nav gel de jî wek *keskê seyîdan* tê zanîn[4]. Nîşana welîbûna qencê Xwedê, kerametên wan in. Pêxember mucîzeyan, welî kerametan nişan dikin û di nava gel de îspatkirina welîbûnê encax bi kerametan pêkan e.

Wekî cûreyên din menqebe jî ji bûyeran pêk tên, lê mîna cûreyên din ji aliyê kesan ve tên berhevkirin û pişt re dibin vegotin û bîra gelêrî. Menqebe di nava xwe de hinekî rasteqînîyê jî dihewîne û bi vê taybetiya xwe hinekî ji mesel û efsaneyan diveqete. Cih û wext diyare, kurt in û li gorî efsane û meselan, nîvepîroz in (Ocak, 1992, r. 32-33).

## 1.4. Di Nav Kurdan de Zêw

Di derbarê bêjeya ‘zêw’ê de agahîyên etimolojik û fermî kêm in. Bi kurtayî zêw, di salvegera wefata welî de, roja pencşemê (êvara înê) yan jî roja înê tertîpkirina zîyafeta xwarinê ye. Di nav Kurdan de li her gundekî meşayîxekî wan fadil heye, gundî jê re rêzê digrin û ew meşayîx jî li derdorê wek meşayîxê wî gundî tê naskirin. Bi gelemperî di navbera mehê tebax û îlonê[5] de ev meşayîx tên yadkirin. Her çiqasî bêhtir ev merasîm ji meşayîxên seyîd werin çêkirin jî (Adak, 2004, r. 390) di nav meşayîxe ku tên yad kirin de meşayîxê ne seyîd[6] jî hene.

---

[4] Îro jî di nav Kurdan û misilmanên rojhilata navîn de renge kesk wek renge seyîdan û meşayîxan pîroz tê qebûl kirin. Heta demeke nêz şêxê kurdan ji bo aşîtîya di navbera eşîran de ala kesk didan pêşîya xwe kû ew al pîroz dihat qebûlkirin û êdî kesî nikarîbû li hember derkeve û bi piranî xwînî li hev dihatin.

[5] Her çiqasî li di nav Kurdan de ev wextê bîranînê biguhere jî li herema Turabdînê ev bîranînên meşayîxan bi gelemperî di navbera van mehan de tên pîrozkirin.

[6] Derbarê bêjeyên ‘seyîd’ û ‘şerîf’ de ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Rüya Kılıç, *Osmanlı’da Seyyidler ve Şerifler*, İstanbul, Kitap Yayınevi.

Di wê rojê de di gund de her mal li gorî derfetê xwe xwarinê çêdikin (helbet ya baş û hêja ew e ku heywan werin serjêkirin), li ser sifra dikin û li meydanekî gundî tev de vê xwarinê dixwin. Heta berîya 40 salî di zêwan de kilam dihatin gotin, govend dihatin girêdan û bi şêweyeke karnavalesk dihatin pîrozkirin. Mirov dikare pîrozkirina vê rojê bi eyda/roja mirîya jî bişibîne. Lewra li cîhanê di nav gele biyanî (a herî navdar jî *dia los muertos* e ku wek cejna gelê latînî ya kevnare tê zanîn[7]) de ev eyda/roja bîranîna mirîyan gelekî berbelav e. Weki din di nav Kurdên Êzîdî de ev zêwên mirîyan navdar in û di nava salê de di rojên cuda de û bi navê cuda tên pîroz kirin. Yê herî navdar jî eyda Eyda Dehîye, Gurka Ga û Sersal in. Di van rojan de mirî bi şêweyeke kolektîf û coş tên pîroz kirin (Kreyenbroek, 2013, r. 149-160). Îro jî di nav kurdên sinnî de di cejnên dînî de mirî tên zîyaretkirin, li ser wan dia û Qur'an tên xwendin. Li gelek hereman her rojê pêncşeman (evarê înan) *şîva mirîyan* bi piranî li ser navê meşayîxan tê derxistin ku mirov dikare van rîtuelan wek bîranîn û yad kirina mirîyan şîrove bike.

[7]Ji bo vê cejnê û agahîyên berfirehtir bnr: Adem Sağır, Ölüm, Kültür ve Kimlik: Iğdır Ölü Bayramı İle Meksika Ölü Günü Örneği. Kovara Milli Folklor, Jimar: 98

# BEŞA DUYEM: CUDAHÎYÊN ÎSLAMA KURDAN Û DI ÎSLAMÊ DE CIHÊ JINAN

## 2.1. Îslama Gel (Folk) û Cudahîyên Îslama Kurdan

Li rojava xebatê ku li ser îslamê hatin kirin û bi taybetî jî îslama sîyasî (political islam) bi xwendevanan dane qebûl kirin ku îslam bi dîrok û bawerîya xwe dînekî yekkere ye. Ev nêrîn şaş e, lewra îslam ne bawerîyeke yekkere ye, ew di nava xwe de gelek cudahî, veqetîn û teşeyên heretîk dihewîne. Bi îslamê misilman, bi misilmanan jî îslam nayê fêmkirin. Em dikarin bêjin ku îslamek nîne, îslam hene (Su, 2009, r. 14). Yanî pirjimarî, curbicurî û cihêrengî vexuyaneyê vê îslama ku em behsê dikin in. Ev cureyên îslamê ji alîyê lêkolîneran ve li gor nêrînên cuda û veqetandinên cuda hatine binavkirin. Bo nimûne Ernest Gellner (1994, r. 25) ji bo veqetandinê têgehên *îslama bilind* û *îslama popûler* bi kar tîne. Ahmet Yaşar Ocak têgehên (2021b, r. 29-38) *îslama dewletê* (sîyasî), *îslama medreseyê* (ilmî), *îslama tekyayan* (metafîzîk) û *îslama gel* (popûler) bikar tîne. Ji bilî van têgehan di lîteraturê de muteşer'î (ê girêdayî şerîetê) û xeyrî-muteşer'î (ê ne girêdayî şerî'etê); îslama teorîk û îslama pratîk, îslama ummî û îslama kitêbî, îslama çandî û îslama sîyasî û hwd. jî tên bikaranîn. Li gor nêrîna me veqetandina herî bikêrhatî û gava ku hat bilêvkirin mebesta xwe eşkere dike, têgehên îslama gel (folk) û îslama kitêbî ne[8]. Ji bo îslama gel wateya ku em qebûl dikin ev e: Ji alîyê bawerî û civakî ve şêwejiyanek e ku di navbera îslama ortodoks û heretîk de ye. Di nava xwe de hemanên kitêbî, kevneşopî û çewt (xurafe) di heman demê de dihewîne. Civak bi gelemperî bi van bawerîyan jiyana xwe ya rojane di biwere û pîvanên dîndarîyê jî dise ev in. Şîrove û nêrînên me li ser îslama ku kurd dijîn, diguherînin û pê re jî diguherin hatine avakirin. Wekî her civakên îslamî, îslama kurdan jî yekkere nîne û di nava xwe de gelek cudayîyan dihewîne.

[8] Di zimanê inglîzî de gel wek 'folk' tê bikaranîn ku heman wateyê didin. Sedema bijartina têgeha 'îslama kitêbî' wiha ye: Kitêb (pirtûkê ku di qada dînî de hatin nivîsandin) di nav kurdan de navdar in û pîvandina rastîya tiştan (çi dinyayî, çi jî dînî bin) bi piranî bi şertê ku di kitêban da derbas bibin tên qebûl kirin.

Mînak 142 sal berê Şêx Ubeydilahê Nehrî di nameya xwe de, ji misyonerê Emerîkî Cochran re wiha, gotiye: “Hûn gerek bizanibin ku kurd 500 hezar mal in û neteweyeke cuda ne û bi dîyanet û bi rabûn û rûniştina xwe ne wekî edetên neteweyên mayî ne” (Celîl, 2020, r. 48). Wekî serokekî, Şêx Ubeydilah, ji bo berjewendîyên netewperwerîya Kurdan pêwist bû wiha bêje. Lê di heman demê de Şêx Ubeydilah postnîşînêkî Xalidîyan ê mezin û navdar bû û cudayîyê di navbera bawerîya îslamî ya kurdan û cîranên wan de baş dizanî bû. Dixwest balê bikşîne ser vê yekê ku bawerîya kurdan ya îslamê di nava xwe de cihêreng û xweser e ku ev tespîta wî di cihê xwe de ye. Di esasê xwe de hemû gelên cuda ku bawermendê heman dînî ne, di warê bawerîyê de di nava xwe de cudahîyan dihewînin. Sedema vê yekê ji dîrok, çand, kevneşopî, erdnigarî û hwd. din tê.

Li welatê kurdan dewletên cuda (Med, Sasanî, Îslam, Roma û hwd.) bûn desthilatdar û bi van dewletan re bawerîyên cuda (Zerdeştî, Îslam, Ezîdîti, Mesîhîtî, Cihûtî û hwd.) belavbûn. Di dawîyê de kurdan bi gelemperî bawerîya Îslamê qebûlkirin lê helbet bawerîyên xwe yên berê û piştî qebûlkirinê jî bawerîyê cîranên xwe (ên neîslamî) daxilî bawerîya xwe ya nû kirin. Tişta ku derket holê û îro jî kurd vê dijin, bi nêrîna giştî îslam e lê bi hûrgilî bawerîyeke senkretîk e. Kurd, di warê bawerîyê de ji rêya îslama kitêbî hinekî dûrin, bawerîyên wan bi gelemperî mîstîk û “nelirê” (batil in) ne. Bandora Zerdeştîyê li ser wan xurt e (Nikitin, 1991, r. 383-384). Rojhilatzanê wek Louis Massignon (Vgz. Nikitin, 1991, r. 7), A. M. Hamilton (2009), R. P. Giuseppe Campanille (2013), Thomas Bois (2004), E. W.Charles Noel (2014) jî nêrînên nêzî Nîkîtîn îdia kirin e. Her çiqasî rojhilatzanî bi gelek şêwe û nerînan hatibe rexne kirin jî ev îdiayê li jor di nava xwe de alîyekî rast jî dihewînin. Heta îro jî di nav kurdan de rojên wek cejn, şahî û bîranînan bi şêweyeke zindî tên pîrozkirin ku di nava wan de gelek bermayî û şopên heretîk hene, ango rasterast çavkanîyan xwe ji van bawerîyên heretîk, kevnare û neîslamî digirin. Newroz, serê salê, xidirelez (zêwa şeşê gulanê), bûka baranê, çarşema sor, eyda dehîya, gaxan, tenê çend nimûne ji van hêmanên heretîk in (Goyi, 2020, r. 243-248). Bi taybetî jî li ser Şêx Momina Mirada kult û statuya wê a di nav kurdan de em ê şîrove û nirxandinên xwe di beşên jêr de bi berbirehî dîyar bikin.

## 2.2. Di Dîroka Îslamê De Cihê Jinan

Di kitêb û bawerîyên monoteîst (Brahîmî) de ku temamê wan çavkanîya xwe ji genesîsa semîtîk digirin jin, ji bedena mêr (li gor Tewratê Hewa ji parsûyê Adem) hatîye afirandin, Topaloğlu, 2004, r. 63-65). Li gor vê bawerîyê jinê mêr xapandîye, bi şeytên re *fitne* kirîye û ev yek bûye sedema qewirandina mirovatîyê ji cem Xwedê yan ji biheştê. Yanî sedema guneha yekemîn (peccatum originale) jin e. Di warê rêzkirina afirandinê de rewşa jin û mêran li ser newekhevîyê avabûye û pişt re jî ev bawerî di dîroka mirovahîyê de ji bo têgeha *fitratê (raserîya çandî û bîyolojîk)* bûye pejrîneke xwezayî.

Dîrok ne li ser xêzekê lê ew bi şêweyeke rîzomatîk[9], wekî dareke biçiqil ku şaxê wê berbelavin diqewime û herwiha didome. Çand û civak li ser zemîneke sabît narûnin, beramberî hev dewamî hevûdû diguherînin. Lewra li rojhilata navîn jin bi temamî û dewamî ne bindestbûn. Bi giştî di nav misilmanan de bawerîyek wiha heye: Berî dînê îslamê jin bêqîmet bûn, keçik sax dihatin binerdkirin, mêr ji bo zewicandinê heta xwestibane dikarîbûn bi zewicin û hwd. Îdiaya ku dînê îslamê kuştina keçikan qedexe kir, di mîrasê de par da wan û hwd. şîroveyê hesan û qels in. Berî ku dînê îslamê belav bibe jî di nav gelê rojhilata navîn de bawerîyeke wekhev û yekkere nebû. Helbet li gor ku bawerî ne yekkere bû edet û kevneşopîyên wan jî ne ji hev cuda bûn (Öztürk, 2012, r. 19-20). Di dîrokê de civak û etnîsîteyên matrîyarkal, xwedî xwedawenê jin[10], pêxemberê jin, jinê rahbik yan jî serokê bavik û eşîran her wextî hebûn û ev tez bi piranî ji bo demên berîya îslamê jî derbasdar e.

Di dinê xirîstîyanîyê de dema ku Hz. Îsa pêxemberîya xwe eşkere kir bawermendên wî ê pêşî jin bûn û şîretên wî ji alîyê jinan ve bi eleqe dihatin şopandin. Lewra Hz. Îsa ji hûr û gir, jin û mêran re şîreta rêzgirtina takekesîtîyê dikir. Vê yekê bala jinan kişand û bawermendê pêşî bi gelemperî jin bûn (Berktay, 2012, r. 98). Piştî Hz. Îsa ev rewş bi neyînî guherî, jin û mafên wan hatin winda kirin. Berî ku îslam derkeve û berbelav bibe li rojhilata navîn ji xwe hêdî hêdî rewşa jinan bineyînî diguherî (Berktay, 2012, r. 119). Bêşik Hz. Mihemed ji bo daxwaz û mafê jinan hesas bû û ev

---

[9] Di derbarê têgehê de ji bo agahîyên zêdetir bnr: Sutton, Damian û Jones, David Martin (2016). Yeni Bir Bakışla Deleuze, İstanbul: Kolektif Kitap.

[10] Berî dînê îslamê di panteona ereb û bedewîyan de Lat, Menna û Uzza xwedawenê jin bûn û pîroz û mezin dihatin qebûlkirin.

hesasîyeta xwe di gelek hedîsan û jiyana xwe de dîyar kiribû. Wekî derketîna hemû dînên li ser rûyê dinyayê dema ku dînê îslamê derket holê jin di qada qebûlkirin û belavbûna îslamê de gelekî roleke girîng girtin. Bawermenda îslamê ya pêşî Hz. Xetîce bû û ew jineke navdar û bi bandor bû ku qebûlkirina wê ji bo pêşketina îslamê gaveke mezin bu. Hz. Mihemed ji bo jinan gelek reform û guherînên erênî kirin ku di paşerojê de ev reformên wî ji şerîet û fiqihê re bûn çavkanî.

Piştî mirina pêxember, hişmendîya patrîyarkal hêdî hêdî qewîn û resen bû û di warê mafên jinan de nêrîta neyînî bi fiqih, hedîs, tefsîr û kelamê hat pejirandin. Nêrîna patrîyarkal xwe spart ayet û têgehên wek qewam (serdestî), hîmaye kirin û hefz kirin (parastina mêr) ku di Qur'anê de di gelek cihan de derbas dibûn[11]. Bonimûne têgehên wek qewam, telaq, niş'ûz ji bo serdestîya mêran di lîteratura fiqihê de bûn wek paldankên giran (Hosseini, 2017, r. 51-53). Bi giştî jî piştî sedsalên 11 û 12'an de çewisandina li ser jinan xurt û qewîn bû ku êdî ew wek çavkanîyên bêyomîtî dihatin dîtin û miameleya heyîneyên nîv-mirov û nehêja didîtin[12]. Jin, bi gelemperî bûn bawermendê di hindirê malê û veşartî.

### 2.3. Di Dîroka Tesewwufê De Rola Jinan

Tevî ku di dînê îslamê de jin û mafên wan hatin paşguh kirin û wenda kirin jî qada ku navê jinan herî zêde tê de derbas dibe û jin jî *'hema bêje'* bi qasî mêran qebûlkirineke dînî û civakî dibîn in qada tesewwufê ye. Ev bawerî paşxaneya xwe ji gelek ayet û hedîsan digire. Bonimûne di sûreya Beqere ayeta 269'an de wiha dibeje: "Xwedê, kê bivê hîkmetê dide wî/wê û ji kê re hikmet bê dayîn, bi rastî xêreke pir jê re hatiye dayîn." Yanî li gor bawerîya îslamê hîkmet, xweşxwazî û îkrama Xwedê ye. Mirov bi amelê baş ku rêya Xwedê bimeşîne dê ji alîyê Xwedê ve bê xelat kirin. Li gor bawerîya îslamê Xwedê di navbera evdê xwe de veqetînê nake; raserî, bi teqwayê ye (Çalışkan, 2017, r. 110).

Her çiqasî di warê tesewwufê de jinan pileyeke bilind girtibin jî bandora genesîsa rojhilat rengê xwe li ser vê bizavê jî dîyar kiriye. Wekî ku jin wek sedema gûnehê Hz. Adem hatiye qebûlkirin, gelek mutesewifê mêr jî bi şêweyeke neyînî li vê mijarê

---

[11] Ji bo ayetên di derbarê jinan de bi taybetî bnr: Sûreyên Nîsa û Beqere.

[12] Ji bo agahîyê zêdetir bnr: Hidayet Şefkatli Tuksal, *Kadın Karşıtı Söylemin İslam Geleneğindeki İzdüşümleri*, Ankara, Otto Yayınları.

nêrîne. Îmamê Xezalî, Hucwîrî, Mewlana Celaledînê Romî, Şehabeddîn Emerê Suhrewerdî çend ji wan kesan in ku li sofîtî û welîtîya jinan bi neyînî nêrîn e. Di tesewwufê de peyva *nefsê* ku biçuk kirin û korkirina wê gelekî girîng e di wateya hewes, daxwaz û îştehê de hatiye bikaranîn. Zayenda vê peyvê di zimanê semîtîk de mê ye û bikaranîna wê jî jinan nîşan dike. Nefs, bi wateya xwe ya etîmolojîk û tesewwufê de jinê, malê dinyayê, jiyaneke pespaye û dijexlaqîtîyê sembolîze dike (Smith, 2016, r. 17-18, Schimmel, 2011, r. 24).

Tesewwuf li gor welîbûnê perwerdebûne dixwaze. Heta ku kesek di tesewwufê de payeyeke bilind bibe dibe ku intîsabî tekyayekî yan jî şexêkî kiribe, bi keve xilwetê û şertên din bîne cih. Yanî mirov gava ku bi giştî li rewşê dinêre ev rê û rêbaz di nav civakê de wekî karê mêran tê qebûl kirin û bi rastî jî jinê ku van rê û rêbazan wekî mêran pêktînin gelekî kêm in. Lê di warê welîbûnê de ev rewş diguhere lewra welîbûn ne tenê bi xwendin û mirîdbûnê ye. Wekî me li jor gotî welîbûn bi xweşxwazîya Xwedê û teqwaya evdê wî ye. Lewra di nav civakê û dîrokê de welî her tim ji mutesewwifan zêdetir in.

Di dîroka tesewwufê de jinên navdar bi du senifa tên veqetandin: Jin, keç û xûşkê welîyê mêr û jinên ku bi teqwa, îman û kerametê yanî bi serê xwe bûn welî. Di bawerîya sinnî û şiîyan de jin û keçên pêxember û sehabeyên wî ê jin wek welî hatine qebûlkirin û dikevin kategorîya yekemîn de. Bi ser de li gor lîteratur û bawerîya şiîtîyê welî tenê ji zuryeta pêxember yanî ji seyîd û şerîfan derdikevin. Lî dij bawerîya giştî di dîroka îslamê de jinê welî, sofî û mutesewwif gelek in lê sedema ku nivîskarê vê bizav û menqebeyan bi gelemperî mêr in, navê van jinê sofî û welî kêm gihiştiye çaxê me. Rabîa el Edewîye, Meryem El Besrîyye, Behrîye el Musilîyye, Rihana el Walîhe, Muaze el Edewîye, Şa’vaneya Ubûlî, Emîna er Remlîyye, Fatîmaya Nîşaburî, Rabîa bintî Îsmaîl, Kerîmaya Mervî, Xetîce el Cehnîyye, Eshîya Nîlî, Keçmîr Fatîma Cîhanara, Fatîma Haceranî çend jinê welî û sofî yê navdar in ku navê wan di menqebe û kitêban de derbas dibin.

Ji xeynî van jinên bi welîbûna xwe navdar, ji destpêka tesewwufê heta dema niha di nav terîqetan[13] de ê ku mirîdên wan bi piranî yan jî bi temamî jin bûn jî hebûn. Ev

---

[13] Wateya peyvê ji bo eşqa Xwedê, rêya ku bê şopandin e. Li gor tesewwufê girêdana terîqatê, ji bo gihiştina batinî pêwîst e.

terîqat li Mekke, Medîne, Şam, Bexda, Silêmanîyê û bajarên kevnare de di nav jinan de bi navûdeng bûn. Bonimune terîqeta *Dar el Felek* li Bexdayê, *Ribat ez Zahîrîyye* li Mekkeyê ku mirîdê wan tev jin bûn di wextê xwe de gelekî navdar bûn (Schimmel, 2011, r. 50-51). Mûrşîdê van terîqetan bi piranî jin û keçê şêxê derdora heremê bûn û wezîfeyên wek weaz, nimêj, tobe dayîn û perwerdeyê jî ji alîyê van murşîdê jin ve dihatin pêkanîn.

### 2.4. Jinên Kurd ên Alim û Sofî yên Navdar

Kurd jî wekî gelê derdor û cîranên xwe bi piranî patrîyarkal in û ev sîstem raserîya mêran qebûl dike. Tevî vê raserîya mêran di nav kurdan de, jinan jî gelek caran, li gelek heremên kurdan pileya mêran bidestxistine. Di warê ku jinan pileyên girîng girtin, di nav faris û ereban de mînakê wiha kêmtir in. Piştî ku îslam ji alîyê cîranên kurdan ve hat pejîrandin jinên bihêz û navdar kêmtir derketine. Lê gava ku em li kurdan dinêrin heta van demên dawî jî jinê serok û navdar ji nav wan derketine û ev xûyanîya jinan ji bo kurdan fenomenek e tîpîk e. Bo mînak Bruinessen di xebata xwe ya ser geştnameya Evlîya Çelebî behsa rewşa jinên kurdan dike û dibêje Evlîya Çelebî bi xwe jî derbarê statûya jinên kurdan da matmayîye. Lewra di geştên xwe de ew bi xwe bûye şahid û di kanûnnameyên Osmanîyan agahîyên ku dîtin e bûne sedema şaşmayîna wî (2005, r. 136-137). Ev heyîrîn bi geştyarên rojavayî re jî xuya dike. Piştî sedsala 18an gelek rojhilatzan û mîsyonerên Ewropayî li welatên kurdan gerîyane û çavdêrîyên xwe nivîsandine. Di wan nivîsan de tê gotin ku jinên cîranên kurdan çarçef li xwe dikirin û bi piranî rûyê xwe diveşartin, lê jinên kurdan ne çarçef li xwe dikirin ne jî rûyê xwe digirtin. Ev çavdêrî ji bo van geştyar û mîsyonerên bîyan sedema heyîrînê bûn. Di qesrê mîrên kurdan de wekî mîrek û serokê cîranên kurdan harem tune bû û polîgamî[14] îstîsna bû. Li gor van çavdêran di jîyana rojane de azadîya jinên kurdan,[15] li gor cîranê wan taybetmendîya wan a sereke bû (Galetti, 2005, r. 284-288). Heta ku islama kitabî, bi taybeti ji ya selefi, di nav kurdan de berbelav nebûbû, ev rewşa jinên kurdan wiha bû. İro jî di nav kurdan de eger jin serdestî mêrê xwe bê yan jî di ciwanîya xwe de bî ma be, zarokên wê bi navê we tên

[14] Zewaca mêr an jî jinekê, ji yekî/kê zêdetir.

[15] Helbet divê em vê hişyarîyê de bin ku ev nêrînên ku me li jor anîn ser zimên nayê wateya ku jinên kurdan serbest in û pêdivîya wan bi serbestîyê tune ye.

binavkirin û dinav civakê de wiha tên zanîn û qebûlkirin. Herwiha ev rewş di nav civakê de ji bo mêr wekî kêmasîyekî nayê dîtin.

Di civaka kurdan de wekî tê zanîn nivîsandin rewşeke îstîsna ye, kevneşopî û veguhastina devkî ji rêzê ye. Herwiha kitêb û qeydên arşîvan ji alîyê mêran ve hatine nivîsandin, jiyana welî û sofîyan ên ku tên zanîn tev ji alîyê mêran ve hatine nivîsandin. Yanî bi kurtasî nivîsandin û qeydgirtin di dîrokê de bûye karê mêran lewra jinên sofî, zahid, alim û navdar navê wan kêm gihştiye dema me. Lê dîsa jî çend jinên navdar ku navê wan heta îro hatîye û em wan zanin hene. Mînak:

**Hefseya Kurdîye:** Xatuneke oldar, arif û zahid e. Di berhemên Ebdurrehmanê Camî û Îbnûl Cewzî de wek yekem ewlîyaya kurd a jin derbas dibe (Cirik, 2019, r.114). Keça Emerê Besrî ye, piranîya temenê wê bi hevaltî û xizmeta Şe’wanîyeyê re derbas bûye. Di sedsala 2/8’an de jîyaye (Rûhanî, 2020, r. 49).

**Fexrunîsa Şehdeya Dînewerî:** Di navbera salên 1089-1178an de li Bexdayê xwedê daye û li wir jiyaye. Ev jin di ilmê fiqih, hedîs û rîwayetê de alimeke navdar bû û bi van zanînê xwe ji derdora xwe re şêwirmendî dikir. Di heman demê de bi destxetên xwe jî dihat naskirin, ku ji ber vê yekê jê re *Şehdetul Katîbe* dihat gotin. Di nav feqihê wê de kesê wek Îbn Cevzî, Sem’anî, Îbn Asakîr jî hene kû di warê hedîs, fiqih, sîyer û dîrokê de berhemên girîng û navdar nivîsandine (Rûhanî, 2020, r. 105-106, Yıldırım, 2018, r. 305).

**Zeyneba Sêrtî:** Ev jin di navbera sedsalê 7-8/13-14’an de li Qahîreyê jîyaye û li wir koça dawî kirîye. Di ilmê hedîsê de navdar e û Îmamê Zehebî û Teqyeddîn Sûbkî ku her dû kes jî di qada xwe de navdar in, xwendekarê wê bûn (Rûhanî, 2020, r. 165, Yıldırım, 2018, r. 308).

**Esma Xatûn Hekarî û Cuveyrîye Xatûn Hekarî:** Xwîşkê hev in, alim in û her du jî di ilmê hedîsê de navdar in. Esma Xatûn di navbera salên 1296-1368an û Cuveyrîye Xatûn jî di navbera salên 1302-1379an de jiya ne  (Yıldırım, 2018, r. 309).

**Selma Xatûna Cizîrî:** Hafiz e û di ilmê hedîsê de jineke navdar e. Di sedsala 9/15’an de jiya ye (Rûhanî, 2020, r. 196).

**Emetûllah el Kurdîyye:** Ji kurdê Hekarîya ye û di sedsala 9/15an de jîya ye. Di serdema xwe de bi hedîszanîya xwe bi navûdeng bû. Wê bi xwe jî gelek xwendekar

hînkirine û îcazet daye wan. Yek ji feqihê wê hedîszan û dîroknasê mezin Şemseddînê Sehavî ye (Yıldırım, 2018, r. 310).

**Eyşa Cizîrî û Fatime Cizîrî:** Keçên Şemseddîn Mihemed Îbnûl Cizîrî ne. Du jinên alim in û di ilmê hedîs û fiqihê de zanyar in. Di heman demê de di medreseyê de dersa feqihan jî dane. Di sedsala 9/15'an de jiya ne (Rûhanî, 2020, r. 198, Yıldırım, 2018, r. 310).

**Fatima Xatûna Goranî û Suteyte Xatûna Goranî:** Xwîşkê hev in û di navbera sedsalên 8-14/9-15'an de jiya ne. Li Şam û Bexdayê ligel alîmê wê demê dersên wejêyê û ilmî wergirtine û mamostatîya medreseyê kirine (Rûhanî, 2020, r.204).

**Sahibe Sultana Dunbilî:** Wek Heyran Xanim tê zanîn. Li herêma Urmîye û Tebrîzê di navbera salên 1790-1868an de jîya ye. Di ilmê stêrknasî û destnivîsê de navdar e. Bi kurdî û farîsî helbest nivîsandine ku dîwana wê ji 6500 beytan pêk tê (Rûhanî, 2020, r.447, Yıldırım, 2018, r. 311-315).

**Mestûre Xanima Erdelanî:** Ji Sîneyê ye û di navbera salên 1805-1845'an de jîya ye. Li gor wextê xwe di warê dînî û edebî de perwerdeyeke baş dîtîye. Bi kurdî û farisî helbest nivîsandine, pirtukên derbarê 'eqîde û telîmatên îslamî de amade kirine. Berhema wê ya herî navdar pirtûka bi navê 'Tarîxa Erdelanê' ye (Rûhanî, 2020, r. 475-481).

**Seyîde Fatime Xalidê Neqşebendî:** Keça Mewlana Xalidê Şehrezorî ye, di navbera salên 1827-1863yan de jiya ye. Ji bavê xwe dersên tesewwûf û îslamî wergirtine, hînî farisî û erebî bûye. Li Şamê, di dergeha bavê xwe de dersên mirîdên jin daye (Rûhanî, 2020, r. 556).

**Eyşa Turcanî:** Ji malbateke alim û mela ye. Di navbera sedsalên 19-20an de jiya ye. Xwendinê xwe yê pêşî li cem bavê xwe wergirtine û ji feqihan re ders daye (Rûhanî, C.2 , 2020, r.187).

**Xurşîd Xatûn:** Ji Merîvanê ye û di navbera salên 1881-1931an de jîya ye. Di ilmê serf, nehîv, 'eqaîd û mantiqê de navdar e. Dayîka şairê navdar Kanî' Merîvanî ye (Yıldırım, 2018, r. 317).

# 3- BEŞA SEYEM: ŞÊX MOMINA MIRADA Û KULTA WÊ

## 3.1. Çîroka Welîbûna Şêx Momina Mirada

Çîroka welîbûna Şêx Momina Mirada di nav gel de kêm û zêde bi teşêyen mîna hev tên vegotin. Ji devê vebêjerên jin û mêr me agahî derbarê wê de berhev kirin. Çîrok wê wiha ye:

Bapîrê Momîna bi texmînî berîya 400-500 salî hatîye Xelîla û ew bi eslê xwe ji Dînûwê ye[16]. Momîna keseke sêwî ye. Dayika wê ji zû ve mirîye û bavê wê careke din zewicîye. Jinbava wê, wekî hemû jinbavan jê hez nake û zilmê lê dike. Her sibehê gava ku Momîna ji xewê şîyar dibe, jinbava wê dibîne ku nav cilê wê yê razanê şil in û jinbava wê gilîyê wê li cem bavê wê dike. Di bêje 'keça te kunemîz e, bûye jin lê bi xwe de mîz dike'. Ev rewş bi vî awayî demekî dewam dike. Her sibeh jinbava wê gazinan dike lewma bavê wê jî xemgîn dibe. Momîna jî di vê derheqê de qet xeber nade. Bavê wê dibeje "derdekî keça min heye" û êvarekî gava ku hemû kes di raze, nîvê şevê bavê Momîna lê nobetê digre û bi dizî wê taqîb dike. Nîvê şevê Momîna ji nav cihê xwe derdikeve, bêyî ku derî veke dibe çûk,[17] di qula derî re derbas dibe, di raje dêwlê û diçê ser devê çalê. Pezê kovî li ser devê çalê li hêvîya wê ye. Bi dêwlê avê dikşînê û pezê kovî yê tî bûyî av dide. Piştî ku pez têr av divexwe, careke din bi dizîve di vegere malê, di qula derî re derbas dibe û dikevê nav cihê xwe yê razanê. Wê şevê bavê Momîna bêşik bawer dike ku keça wî ne keseke ji rêzê ye, ew welîyeke Xwedê ye. Sibehê şîyar dibe, ji jina xwe re di bêje: "Êdî ez qet gazinên te yê li ser Momîna qebûl nakim, keça min bêguneh e". Piştî wê kêlîkê û pê de nihênî û sirrê Momînayê li derdorê belav dibin.

Nihênîyên Şêx Momînaya Miradan ewqasî belav dibe ku şêx û alimên ku di qada xwe û tesewufê de otorîte ne ji vê yekê haydar dibin. Ji Bexdayê bi rê dikevin û dixwazin ku Şêx Momina Miradan ziyaret bikin. Ji bo ceribandinê[18] ji şimayê bûkekî çêdikin, di 'ebayê xwe de di veşêrin û tên serdana wê. Gava ku mevanê wê didin

---

[16] Ev agahî ji alîyê Hemed Elîyê Mala Qaso û Hemedê La'lê ve hatîye dayîn. Li gor gotinên wan Dîniwê îro xerabeye û di navbera Hespistê (Yarbaşı) û Xerabê Şeref (Dirsekli) de ye.

[17] Di vir de vegotin li gor li gor vebêjan hinekî diguhere. Vebêjekî got wek mû, yekî got bayê tenik û duduyan jê jî gotin wek çûk (vebêjekî jî bidetay kir û bû kevok) di qula derî re derbas bû.

[18] Li gor Menîca Helokê û hevjinê wê Elîyê Neso sedema zîyareta van alim û şêxan ew îddiaye ku ji Kurdan welî dernakevin, bi vê yekê bawer nakin lewma dixwazin ku wê bi çavê xwe bibînin. Li gor Gozela Xelîlî û Hemed Elîyê Mala Qaso jî sedema zîyaretkirinê angaşta ku *ji jinan welî dernakevin* e. Van kesan çîrok wiha di honandin.

devê derî, Şêx Momina Miradan dibêje: *"Şêx hatine ji Bexdayê / Bûk çêkirine ji şimayê / Hatin ber sirrê Momînayê / Hê jî bawerîya wan lê nayê".* Alim û şêx şaş dimînin û bawer dikin ku Şêx Momina Mirada xweyî nehênî ye û dosta Xwedê ye. Şêx Momîna di nav mêvanê xwe de dirûnê û mazûvantîya wan dike. Di bêje mirîdekî xwe (navê wî Sofî Hacî ye û ji bavikê Sînkîya ye) "here nav rezê me yê Benê Delika[19] û ji mêvanên me re tirî bîne'. Sofî Hacî dibêje 'nîvê kela zivistanê ye ez qurban! Tirî vî wextê salê çi dike?' Şêx Momîna di bêje "ez di bêjim te, here û pirsan neke!". Sofî Hacî di raje selika xwe û diçe nav rêz. Di meyzênê ku her der tije tirî û hejîr e. Selika xwe ji tirî û hejîran tije dikê û mêweke tirî û dareke hejîrê jî ji bo ku pişt re ji zarokê xwe re bibe, dihêle. Tirî û hejîrê ku anîn li ber mêvanê Şêx Momina Mirada rast dike û xwe dide alîyekî. Şêx Momina Mirada dibeje "Sofî Hacî, were bixwe, dûr nemine", Sofî Hacî dibêje "ez qurban ji ber ku min li nav rêz xwaribû ez têr im". Şêx Momîna dibêje Sofî Hacî "were bixwe, ew xewna ku tu dibîne betal e, were!". Sofî Hacî diricife, plana ku di serê xwe de kirî ji mêvanan re jî îtîraf dikê û efûkirina xwe dixwaze. Ji wê rojê û bi vir de ewlîyatîya Şêx Momina Mirada qewîntir, geştir û berbelavtir dibe.

Piştî ku welîtîya Şêx Momina Mirada bi navûdeng dibe ji gundîyan cihê ku jê re bibe goristan dixwaze. Xelîlîyan derbarê wê de gotine "jineke, keçikek e. Ne dê ye ne bav e… Wê çawa bê zîyaret û meşayîx. Ji heft bavikê Xelîlîyan cih xwestîye, çûye cem Budaxkîyan cih xwestîye, nedanê de. Wê jî bêduayî li wan kirîye, gotîye "Xwedê bike hûne reş bin", ew bavik îro jî hemû reş in. Çûye cem Sînkîyan cih xwestîye, nedanê. Bêduayî kirîye, gotîye "Xwedê bike hûne kêmbin"; îro ew bavik kêm in. Ji Şêrîlkîyan xwestîye, nedanê de. Gotîye: "Xwedê bike hûne zilm bin", îro ew bavik bi zilmîya xwe tên zanîn. Ji Eslankîyan xwestîye, wan jî nedaye. Bêduayî kirîye, gotîye "Xwedê bike hûne keçel bin"; zilamê wî bavikî îro keçel in. Çûye nav Hûrikîyan cih xwestîye, nedane. Gotîye: "Xwedê bikê hûne hûr bin"; îro ew bavik tev hûrik in. Piştî ku Bûdaxkî li sirr û welîtîya wê êmin bun, cih danê de. Îro meşayîxê wê di nav axa Budaxkîyan de ye[20]. Şêx Momina Mirada nezewicîye, li nava gund, di

[19] Ev rez îro bûye gun, taxa Xelîla ya nû li vê derê avabûye.

[20] Ev vegotina li ser nifir û bavikê Xelîlîyan, tenê ji alîyê Eyşa Xelîlî ve hatin veguhastin (10.05.2022). Di nava gund de kesekî gundî vegotineke wiha ji me re negotin. Li gor me ev wek kemasîyekî û cihê

şikeftekê[21] de zarokan hînî Qur’anê kirine û wek keseke welî, bi şêwejiyaneke zahid heya dawîya temenê xwe rêya Xwedê meşandîye.[22]

Rezan Karakaş di lêkolîna xwe ya bi navê *Güneydoğu Anadolu Halk İnanışları (Dicle Bölümü)* de çîroka welîbûna Şêx Momina Mirada bi varyanteke cuda didomîne. Ev varyant wiha ye: Şêx Momîna dibêje mêvanê xwe “berî ku em derbasî îmtihanê bibin em hinek tirî bixwin”. Mêvan dibêjin “vî wextê salê tirî çi dike?” Şêx Momîna her yekî, kêrekî dike destê wan û wan dişîne nav rêz. Alim û şêx diçin nav rêz û heyirî dimînin. Di nêrin ku her der tije tirî ye. Bi kelecan dest bi çinîna tirî dikin û piştî demekî tên ser hişê xwe. Dinêrin ku bi kêrê di destê wan de, ne tirî lê, riha xwe qusandin e. Di wê kêlîkê de bawer dikin ku Şêx Momîna welî û dosta Xwedê ye (2020, r. 121). Di dema berhevkirina daneyên me ê sehayê de bi ti awayî vegotineke wiha ji alîyê niştecihên heremê ve ji me re nehatîye gotin û ev veguhastin lewma balkêş e.

## 3.2. Dahûrandina Motîfên Çîroka Welîbûna Şêx Momina Mirada

Di çîrok û menqebeyan de motîf hêmaneke girîng e û herwiha di çanda devkî de xwedî taybetiya bîranînê ye. Çîrok, ji lihevhatina motîfên watedar pêk tê, bêyî motîfan çîrok qels dimînin. Di çîrokê de motîf berî mijarê tê ku beyî afirandina motîfan û anîna wan a cem hev, mijarê ava dike. Ji alîyê avakirina vegotinê ve hêmanên herî biçûk in ku hem bi serê xwe wateyeke wan heye û hem jî di nava vegotinê de, dibin perçeyeke çîrokê. Çend motîfên sereke ên ku di çîroka welîbûna Şêx Momina Miradan de me tespîtkirin û emê wan bi nirxînin ev in:

### 3.2.1. Motîfa Jinbavîyê

Di nav hemû civakê cîhanê de û çîrokê gelerî de hin leheng tîpên sembolîk in û taybetiyên karakterîstîk nîşan didin ku jinbav yan jî dêmar jî lehengek ji wan e. Piranî keçhelîya (nevisiya) wê sipehî û jêhatî ye lê keça wê kirêt û nekirkêr e. Ji ber vê yekê jinbav her tim hesûdiyê dikin. Di hin çirokan de şûna keçhelîyê keça xwe derxin pêşberî xwezgînîyan. Jinbav her tim wek kesên bêrehm, bêwijdan tên teswîr

---

şermîyê didîtin lewma behs nekirin. Eyşa Xelîlî bi rihetî got lewra ew zewca Basqilîyan bû û têkilîyê wê bi Xelîlan re pir kêm in.

[21] Ev şikeft îro ji di nav gundîyan de wek Şikefta Şêx Momîna tê zanîn.

[22] Vegotinên niştecihên heremê bi hûrgilîyan ji hev diguherin. Piştî tomarkirina hevpeyvînan çîrok ji alîyê me wekî li jor hatîye nivîsandin. Vebêjerê me ev in: Bihara Xelîlî, Eyşa Xelîlî, Gozela Xelîlî, Menîca Helokê, Hemed Elîyê Mala Qaso, Mele Evdile Kurdî, Elîyê Neso, Hemedê La’lê.

kirin û dixwazin ku keça wan ji keçhelîyên wan baştir, xweşiktir û jêhatîtir bin. Bi gelemperî mêrên xwe dixapînin, bêbextîyan û derewan dikin, da ku keçhelîya xwe bidin kuştin yan jî qet nebe wê bidin mêr da ku jê xelas bibe. Jinbav yan jî dêmarî di her çîrokê de wek kesên xirab, hesûd, nebaş, fêlbaz, hîlekar xwe nîşan didin. Di gelek çîrokan de jinbava leheng di heman demê de ezmûna wê ye ku pêwîst e leheng bi ser bikeve.

Ji bo çîroka welîbûna Şêx Momina Miradan jî ev taybetmendîyên karakterîstîk ên jinbavîyê xwe nîşan didin. Jinbava wê jê hez nake, li cem bavê wê hesûdîyê û fitnê dike lê bavê wê li dijî çîrokên gelemperî wekî mêrên saf bawerî jina xwe nake. Bêyî ku Şêx Momina Miradan ji bo xelaskirina ji zimanê jinbava xwe tevbigere, bavê wê derdê keça xwe fêm dike. Yani ew ji bo felata ji jinbava xwe tiştekî nake û tevgereke wiha ne hewceye jî. Lewra ji bo îspatkirina welîbûnê, felatên derasayî û hesanî pêwîstin ku di vir de jî em mînakeke wiha dibînin.

### 3.2.2. Motîfa Bûyîna Çûk Yan Jî Kevokê

Di cûreyên edebîyata gelerî de ev motîf pir tê bikaranîn ku ev motîf di lîteraturê de bi navê *ornîtofanî* tê zanîn. Di vê motîfê de tişta herî girîng ew e ku leheng her çiqasî bikeve şêweya cureyên heywanan de jî puxte ya wî/wê na guhere. Di menqebeyên welîyan de, welî bi piranî dikevin şiklê kevok, çûk (beytik), baz û qulingan de. Ajalên ku herî zêde di menqebe û çîrokan de xuya dikin jî kevok û  çûk in. Sedema bedilîna şêweya kevokê ji xweza û tebîeta vê ajalê tê. Kevok di gelek çand û bawerîyan de wek sembola aşitî, sakîntî, aramî û hizûrê tê qebûlkirin. Bonimûne di Xirîstîyanîyê de sembola rihê pîroz (Rihû'l-Quds) kevok e. Lewma di navbera xuy û tebîetê mîstîk ê welî û tebîetê kevokê de têkilîyeke hevşêwe avabûye. Ev motîf koka xwe ji bawerîyên Rojhilata Asyayî digire ku di gelek menqebeyên Budîzmê de kesên pîroz, kerametên bêdilînê û firandina wekî çukan nîşan didin (Ocak, 2002, r. 222-223).  Her wiha çûk di mîtolojîya bawerîyên rojhilata navîn de wek sembola bêgunehî, sivik bûn û rihê mirovan tê qebûlkirin (Eliade, 1999, r. 553). Di bawerîya îslamê û di nav kurdan de zarok gava ku dimirin eger hê balix nebûbin wek çûkan tên sêwirandin. Li gor bawerîyê sedema ku ji wan re guneh û xêr tune ne, ew wek

çûkan dê li cennetê li ser Dara Tûbayê[23] bin. Herwiha firîşte jî ji bo sivikbûn, lez û bêgunehîya wan wek çûkan bi bask tên teswîr kirin. Di çîrokên gelêrî de zarok ji ber zilma jinbava xwe, jin ji ber zilma xesû û mêrê xwe dixwazin ku bibin çûkekî azad ku ji halê xwe yî bi zext û zor xelas bibin (Yalçınkaya, 2019, r. 951-952). Di nav kurdan de çîroka navdar ya pepûkê mînakeke sereke yê bo vê motife ye. Herwiha di çîroka Şêx Momina Miradan de jî motîfa çûk/kevokê bi vê wate û şêweyê hatîye bikaranîn.

### 3.2.3. Motîfa Avdana Pezkovîyan

Xezal li Rojhilat û Asyaya navîn, bi giştî jî pezkovî di nav çîrok û mîtolojîya kurdan de cihekî girîng digirin. Di nav menqebeyan de ajala ku herî zêde derbas dibe jî xezal yan jî pezkûvî ne. Ev motîf koka ji Budîzmê digire ku di gelek menqebeyên Bûdîzmê de Bûda wek xezaleke di nav daristanê de hatîye teswîr kirin (Ocak, 2002, r. 210-211). Di bawerîya Elewîtîyê de hem xezal hem jî pezê kovî pîroz in lewra xezal wek mirîdê terîqetê hatine qebûl kirin. Di nav kurdên qizilbaş de pezkovî ajaleke pîroz e û ji ber zeximbûn û lezgînbûnê wek sembola Xocê Xizir tê qebûlkirin. Di elewîtîya kurdan de pezkovî, rêhevalê Dûzgin Bava û sewalê Ana Fadîma tên tên qebûlkirin (Taş & Kaval, 2020, r. 682-687). Bi giştî em dikarin bêjin ku ev ajal bûne semboleke taybet ji bo kurdên elewî.

Di bawerîyên elewîyan de kuştina van ajalan qedexe ye û di nav kurdên sinnî de jî nêçîra wan sedema bêoxirîyê ye. Bo mînak di destana Xecê û Sîyabend de herdu xoşewist, piştî gelek astengîyan digihijin hev; Sîyabend ji bo Xecê nêrîyekî pezkûvî dikûje û diçê ser termê wî. Pezkûvî qiloçê xwe li Siyabend dixe û wî di geliyî de diavêje xwarê, Xecê vê rewşê dibinê û ew jî xwe di gêlî de li pey Siyabend diavêje. Du giya li cihê termên wan hêşîn dibin û bilind dibin, digihên heya ber devê latê. Bawerî ew e ku, eger ew her du giya ji ser devê latê bibihurin wê Siyabend û Xecê ji nû vejin û bigihijin hev. Lê her sal di biharê de pezkûvî tên û wan giyayên li ber devê latê dixwin û diçin. Bi vî rengî nahêlin ku Siyabend û Xecê ji nû vejin û bigihên hev. Herçiqasî kuştina wan sedema bêyomîyê be jî ew bi xwe di nav kurdan de wek sembola oxirê hatîye dîtin lewma bawerîya qoqê serê wan yan jî qiloçê wan ji nezer

---

[23] Wateya peyva Tûba; 'bêhtir xweşik' e. Dara ebediyetê yê, xweşbûn û bêdawîtiya xweşikiyên di bihiştê de sembolîze dike.

û hesûdîyê mirovan diparêze di nav kurdan de xurt e. Îro jî kilox û qiloçê van heywanan bi devê derîyan û pêşîya xanîyan ve tên daleqandin.

Di çîroka Şêx Momina Miradan de sedema bikaranîna motîfa pezkûvîyan ji ber taybetmendîyên van ajalan in. Herema cihê welîbûna Şêx Momina Mirada gundê Xelîla ye ku ev gund dikeve alîyê Newala Qorîyê[24]. Newal, bi çîya û zinarê xwe gelekî asê ye û îro jî pezê kûvî li vê dordorê dijîn. Ev ajal, di nav gel de wek ajalên bizdok û tirsonek tên zanîn. Dûrî mirovan, li navserê çîyayê bi star û asê de dijîn ku zehmet mirov dikarin wan bibînin. Lewma di nav gelê heremê de wek sembola razberîyê jî hatine dîtin. Ev ajal, bi şêwejiyana xwe ya ewqas tirsonek û veşarti, li ber Şêx Momina Miradan weke pezê kedî bûne û hatine avdan. Lewma ev rewş di nav gel de wekî bûyereke ecêb û kerametekî hatîye dîtin û qebûl kirin.

### 3.2.4. Motîfa Di Kela Zivistanê De Derxistina Fêkîyên Havînê

Ev motîf di nav menqebeyên azîz û ezîzeyên mesîhîyan de xwe nîşan dide û lewma koka vê motîfê jî ji menqebeyên Xirîstîyanîyê tê. Di lîteratura welîtîyê de ev motîf bi Hz. Meryem navdar bûye û pêwendîdar e. Ahmet Yaşar Ocak jî vê motîfê di nav motîfên neîslamî de disenifîne (1992, r. 95). Qur'an, derbarê vê mijarê de wiha dibeje: "Xwedê xelatên bêdawî dane Meryem, li gel wan xelatan ew wek çîçekekî mezinkir û ew da ber hîmayeya Hz. Zekerîya. Hz. Zekerîya her cara ku dihat cem Hz. Meryem, *fêkîyên bihuştê li cem didîtin*. Rojekê pirsî: Ey Meryem! Ev fêkî ji kû derê ji te re tên?" Wê jî bersiv da: *Ev ji alîyê Xwedê ne, Xwedê kê bivê bêhed û bêhesab riziq didê wan"* (Alî 'Imran, r. 37). Sedema ku li heman erdnîgarîyê misilman û mesîhî bi hevdû re jiyan e, bawerî û kultên wan tevlî hev bûne û bi şêweyeke senkretîk ji alîyê niştecihên heremê ve hatine pejirandin. Herwiha ev ayet jî ji bawerîya kultên hevpar re bûye bingeh û delîl. Bonimûne Xelacê Mensûr di dîroka tesewwufê de ew kes e ku herî zêde bi Hz. Îsa hatîye şibandin. Di menqebeyên wî de jî dîsa ev motîfa dayîka Hz. Îsa xwe nîşan dide ku Xelac fêkîyê havînî di kela zivistanê de dide mirîdê derdora xwe. Ev şibandin ne tesadufeke ji rêzê ye, eslê vê şibandinê ji qeddîşên[25] mesîhîyan tê. Lewma motîf di menqebeyan de wek nîşana derbasbûna îmtihanê û îspatkirina welîbûnê hatîye bikaranîn.

---

[24] Bi tirkî navê wê Cehennem Deresi ye.

[25] Wateya wê *dost û qencê Xwedê* ye. Bi erebî qeddîs, bi sûryanî qeddîş û bi îbranî jî qedoş tê gotin (Gabriyel Akyüz, 20.05.2022).

Di nav welîyê kurdên ku li şûnwarê mesîhîyan bicihbûyîn de jî ev motîfa fêkî û şînîyê havînî bi gelemperî xwe nîşan dide. Sedema vê yêkê li gor me piştî ku misilman hatin heremê li şûna wan ne tenê mal û milkê mesîhîyan lê bîr, bawerî û kultên wan jî temelûk kirin. Derbarê vê motîfê de Fatoş Yalçinkaya çend nimûneyan mînak dide ku niştecihê heremê yên berê Ermenî ne. Li gor bawerîya gelê heremê piştî ku welîyê Xwedê fêkî û şînîyên havînî di zivistanî de şîn dike, êdî gundîyê berê hemû misilman dibin (Yalçınkaya, 2008, r. 35). Ji xwe piştî vê beşê, digêl van agahîyên li jor em ê wek ezîzeyeke Sûryanî behsa Şêx Momina Miradan û temelûk kirina kulta wê bi berfirehî bikin.

### 3.2.5. Motîfa Fêmkirina Armanc û Ramanan

Ev motîf li cîhanê de di nav menqebeyên bawerîyên cuda bi piranî de tê xuya kirin. Nurdan Kılınç İnevi, di xebata xwe ya berfireh li ser motîfê menqebeyan de dibeje ku ev motîf di nav motîfan de ya ku herî zêde xuya dike ye (2019, r. 354). Ev motîf di menqebayan de ji bo îspatkirina welîtîyê wekî xelata Xwedê hatîye dîtin. Welî di vir de ji sînorê dinyaya rasteqînî derbas dibe, jê re wext û mekan ji hole radibin. Li gor bawerîya rîcalû'ul xeybê li ku devera dinyayê hewcedarîya mirovan bi welîyan çêbibe di heman kêlîkê de li wir peyda dibin û pirsgirêkan çareser dikin. Ev pêkanîn jî bi şêweyeke telepatîk pêk tê û ev tê wateya ku welî, armanc û ramanên di hişê mirovan de dikarin fêm bikin û alîkarîyê bidin wan. Di lîteratura tesewwufê de ev hêman wek 'zanîna xeybê' tê zanîn û tê bawerkirin ku xeyb ji welîyê Xwedê re bi keşf û îlhamê eşkere û eyan dibe. Di qada pêxemberîyê de wehî çi be, di tesewwuf û welîtîyê de jî fêmkirina armanc û ramanan jî ew e ku navê wê di qada tesewwufê de dibe îlham û feraset.

Wekî motîfa li jor ev motîf jî bi bawerîya Xirîstîyanî ve pêwendîdar e. Hz. Îsa hem di İncîlê de û hem jî di Qur'anê de ev keramet nîşan daye. Li gor İncîlê Hz. Îsa derbarê jiyana berê ya jineke Samirîyeyî de agahî dane (Yuhanna 4/6-9); di siberojê de bûyerên ku wê bi qewimin eşkere kirine (Matta 24/1-2, 26/6-11) û fikr û ramanên ku di serê alim, karmendê dîn û mirîdê xwe de derbas dibin fêmkirine û eşkere kirin e (Matta 9/1-5, Markos 2/1-9). Herwiha di Qur'anê de jî ev rîwayet wiha derbas dibe: "(…) Bê di malên xwe de hûn çi di xwûn, çi dihilînin ez dê ji we re bêjim. Ger hûn bawermend bin, ev ji we re delîl e"(Alî 'Îmran, 49). Wekî me di serê vê binebeşê de gotî, di gelek menqebe û çîrokê welîyan de ev motîf derbas dibe, lê ji bo rojhilata

navîn bi piranî bi Hz. Îsa ve têkildar e û wek taybetmendîyeke pêxwemberîya wî hatîye qebûl kirin. Di beşa jor de me behsa şibandina Hz. Îsa û Xelacê Mensûr kiribû ku ev motîfa raman û armanczanînê jî di nav kerametê Xelacê Mensûr de xwe nîşan dide (Zerrînkûb, 2017, r. 74). Di nav gel de, keramet û mûcîzeyên Hz. Îsa, ji ber jiyana wan a hevşêwe bi Xelacê Mensûr ve jî hatine danîn. Ev motîf jî delîlek e ji bo angaşta me: Piştî ku di herema Torê de serdestîya dînî û demografîk ji destê mesîhîyan ket destê misilmanan de bawerî û kultên mesîhî jî bi mal û milkê wan re bi awayeke senkretîk hatin temelûk kirin. Dê li beşa werê de em ê li ser vê angaştê bidetay rawestin.

### 3.2.6. Motîfa Rihbirînê Bi Kêran

Wekî me di çîroka welîbûna Şêx Momina Miradan de jî got, di dema çavderîyan li sehayê, em li varyanta birîna rihê rast nehatin. Lê îhtimal ew e ku em bi rastî jî li rasta kesê ku vê varyantê zanin nehatin yan jî berhevkar ew kesê/n ku vê varyantê zanin ne li derveyî Xelîla bûn û çîrok wiha jê re vegotin. Bê çawa be jî varyant balkêş e û hêjayî nirxandin û şîrovekirinê ye. Di dîrokê de qusandin û şekildana rihê di nav civakên cuda de bi wateyê cuda hatîye qebûl kirin. Li gor cihûyan qusandina rihê heram hatîye qebûlkirin. Di nav Mesîhîyan de li gor mezheban ev rewş diguhere ku li nav mesîhîyên rojhilatî berdana rihê; li nav mesîhîyên rojavayî jî qusandina wê hêja û meqbûl e. Di bawerîya îslamê de ji bo qusandin yan jî berdana rihê ti daraz tune ne lê li gor hedîsan, pêxember berdana rihê munasîb dîtîye lemwa di nav misilmanan de berdana rihê sinet hatîye qebûl kirin.

Ji bilî van daraz û qedexeyê dînî wateyên rihê ên zayendî, civakî û çandî jî hene. Di nav civakê rojhilata navîn de rih wek sembola mêranî, dîndarî, zanebûn (alimbûn û pisporî), raserî û desthilatdarîyê qebûl bûye û ev rewş îro jî derbasdar e[26]. Di çîroka welîbûna Şêx Momina Miradan de alim û zanayên ku hatin imtihankirinê jî kesê mêr, alim û dîndar in lewma jî xwedî rih in. Ew wek xwedîyê erka mêranî, zaneyên dîn û otorîte hatine ezmûnkirina Şêx Momînayê ku bawer nakin ji jinan welî derkevin. Di çîrokê de kerameta ku Şêx Momina Miradan nîşan dide û rihên wan alimên mêr bi destê wan dide qusandin ku haya wan ji wan nîne, motîfek e psîkanalîtîk e. Bawermendan, di bîra kolektîf de çîrok wiha honandine ku di dawîya çîrokê de bi

[26] Îro jî di nav civaka kurdan de ji bo kesê şareza, zane û saldîtî têgeha *rihsipî* tê bikaranîn.

qusandina riha van aliman û ev welîya jin wekhev bûne. Sembola mêranî, raserî û pisporbûnê ji holê rabûye, bi nêrîneke morfolojîk li ser asta rihê şibane hev. Şêx Momina Mirada di dawîya çîrokê de biserketîye û bilîndî asta alim û welîyê mêr bûye.

### 3.3. Wek Ezîzeyeke (Saint/Qedîşto) Mesîhî Şêx Momina Mirada

Di serdema ku îslam li nav welatên bîyanî belav dibû kult û bawerîyên kevin û bawerîya îslamê bi şêweyeke senkretîk tevlîhev bûn. Li gelek hereman ev cihên pîroz bi awayeke hevpar ji alîyê bawermendên cuda ve dihatin zîyaret kirin. Piştî ku niştecihêcihên heremê, warê xwe terk kirin ango jî alîyê misilmanan ve hatin qewirandin ew kult û bawerîyên wan jî wek mal û milkê niştecihên berê hatin temelûk kirin. Bo mînak di nav mesîhîyan de kulta herî navdar ya Aya Yorgî/Saînt Georges/Nebî Cercîs e ku misilmanan bi bawerîya Xocê Xizir ve şibandîye û heman kes qebûl kirine (Su, 2009, r. 194). Her çiqasî ji alîyê niştecihên heremê ve Şêx Momina Mirada wek welîyeke misilman hatibe qebûl kirin jî agahîyên derbarê dîroka heremê û motîfên di çîroka wê de îhtîmala ku di eslê xwe de ew ezîzeyeke mesîhî ye, xurt û qewîn dikin. Ji bo îspatkirina ezîzetîya Şêx Momina Mirada di serî de em ê agahîyên derbarê dîroka heremê (delîlê dîrokî) de bidin û paşê jî motîfê çîroka wê ê ku koka xwe ji bawerîyên mesîhîyan digirin (delîlê çîrokî) em ê tespît bikin.

#### 3.3.1. Delîlên Dîrokî

Herema Tor Abdînê, di dîrokê de li nav erdnîgarîya mezrabotan a jorîn wek cih û warê Sûryanîyan tê zanîn. Her çiqasî destnîşankirina vê heremê ji ber nakokîyên sîyasî û dînî zehmet be jî kêm zêde em dikarin wiha bêjin: Li rojava Mêrdîn, li bakur Heskîf, li rojhilat Cizîr û li başûr Nisêbîn sînorê vê heremê dîyar dikin û navenda heremê jî Midyad e. Sûryanîyên heremê berî Hz. Îsa di sedsala 14an de hêdî hêdî li vir civîyane, di sedsala 12an de cihê xwe resen kirine û bûne niştecihên heremê (Bilge, 2011, r. 509-510). Osmanîyan ev der di sala 1518an de bidestxistine û herem, bi navê nehîyeya Torê bi senceqa Heskîfê ve girêdane. Midyad di wê serdemê de gundê yekemîn ê vê sencaqê ye (Erpolat, 2007, 384) ku nifûsa wê bi temamî Sûryanî

ne. Di sedsala 19an de Midyad bûye navenda qezayê û herem, ji vê navendê hatîye birêvebirin (Bilge, h.b., r. 514,). Berî sedsala 10an li herema Torê kurd, tune ne. Piştî vê sedsalê hêdî hêdî li vir peyda bûne lê ev peydabûn jî dîse jimareyeke pir kêm e (Güneş, 2011, r. 83-84). Di sedsala 16an de gundê herema Torê ê mezin Midyad, Zazê, ‘Ernas, Batê, ‘Êwertê, Hapisnasê û hwd. bûn, temamê niştecihan mesîhî bûn û di her gundekî de herî kêm sed mal hebûn (Erpolat, 2007, 388). Yanî bi awayeke demografîk em dikarin bêjin heta sedsala 17an li herema Torê misilman ya nebûn yan jî pir kêmbûn (Güneş, 2011, r. 86).

Eşîra Kurdên misilman ku cara pêşî di herema Torê de cih girtin eşîra Aşita ye. Altan Tan vê agahîyê ji bi xebata xwe ya çanda devkî (2011, s. 103) û Suavi Aydın jî li gor arşîvê Osmanîyan (2022, s. 33) resen dikin. Ev eşîr di serê sedsala 17an de li vir bi cih bûye, lewra ji bo îskana wan di 1613an de ferman hatîye dayîn. Di demeke dirêj de tenê Aşitan li vir cih girtine û ji derdora Kerboran heta bi nehîyeya Zazê di arşîvên Osmanîyan de jî wek *Nehîyeya Aşitan* hatîye nîvîsandin (Aydın, 2022, s. 34-35). Piştî eşîra Aşitan, eşîra Kurdan ya ku duyemîn li vir bi cih bûyî Eşîra Erebîyan e. Pêşîyê ve eşîrê li gor agahîyê çanda devkî li xirabeyên Şatira[27] bi cih bûne û pişt re Xelîla avakirine.

Di sedsala 19an de rewşa heremê di warê desthilatdarîyê de guherîye. Êdî ji mîrê Cizîra Botan Mîr Sevdîn û bi vir de Bedirxanî û walîyên Osmanîyan li ser rêvebirî û desthilatdarîya heremê ketine qirka hev. Di nîvê sedsala 19an de Mîr Bedîrxan Beg, di gelek gund û nahîyeyên heremê de axa (subaşî) tayîn kirine. Van axayan bi piştevanîya wezîfeya xwe ya nû, milk û gundê Sûryanîyan talankirin e. Herema Kerboran, ji alîyê eşîra Erebîyan ve biqasî dirêjayîya 100-150 salî hatîye dorpêçkirin û demografîya heremê pile pile guherîye. Ev eşîr bi eslê xwe ji pişta ava Dîcleyê, ji nav Botan in ku îro ev der dikeve nav axa Sêrtê de (Aydın, 2022, s. 39-40). Eşîra Erebîyan di dema axatîya Elîyê Remo de bi piştevanîya Bedirxan Beg, herema Kerboran bi giştî kontrol kirin e. Bonimune heta berîya tayînkirina axatîya Elîyê Remo di nava Kerboran de misilman qet nebûn. Lê piştî axatîya Elîyê Remo raserbûna Erebîyan resen bûye, lewma zexta li ser Sûryanîyan jî zêde bûye. Li

[27] Şatira, di navbera Kerboran û Xelîla de, 2-3 kîlometreyan ji Xelîla dûr e. Ev der îro xerabe ye û warê Sûryanîyan ê kevin e ku ji kavil û şikeftan pêk tê.

hember vê rewşê Sûryanîyên Kerboran, Mala Mehmûd[28] wek parezgerê xwe dawetî Kerboran kirin e (Hemed Elîyê Mala Qaso, 2022). Her çiqasî Sûryanîyan ji bo parastinê misilman di nav xwe de hewandibin jî zexta li ser wan kêm nebûye, guherandina demografîyê li dîjî wan dewam kirîye. Herwiha ev rewş ne tenê li Kerboran lê temamê heremê kêm zêde bi heman şêweyê pêk hatîye. Bonimûne berî salên 1850î li derdora Midyadê 220 gundên Sûryanîyan hebûn û jimara wan li gor arşîvên dewletê 51.725 kes bûn. Ev jimar di salên Seyfoyê[29] de nêzî 30 hezari kêm bûye (Bilge, 2011, r. 515).

Bi kurtayî em dikarin wiha bêjin: Niştecihên heremê ê pêşîn Mesîhî ne. Di sedsala 17an de hêdî hêdî eşîrê kurdan ên koçer li vir bi cih bû ne lê di warê demografî û rêvebirîyê de hîna jî mesîhî serdest in. Di xelaseka sedsala 18an û serê sedsala 19an de jimareya misilmanan raser bûye û deshilatdarî ketîye destê misilmanan. Bi taybetî, rêvebirî û axatîya herema Kerboran û Xelîla ketîye destê Erebîyan. Ji destpêka ku misilman li heremê bicih bûyîn heta ku mesîhîyên heremê yên dawîn koç kirin, gelek gund û xelwetxaneyên mesîhîyan dagir û talan bûne, çi madî çi jî manewî şûnwarê wan desteser bûne. Herwiha tevî mal û milkên wan, çand û bawerîyên wan jî hatine temelûk kirin. Li gor van agahîyan:

- Niştecihên Xelîla, dema jîyîna Şêx Momina Miradan wek 400-500 sal berê nîşan didin. Lê wek milekî Eşîra Erebîyan Xelîlî herî zû di dawîya sedsala 17an de hatine û pêşî li Şatira[30] pişt re jî li Xelîlaya îro bicih bûne. Yanî herî zêde 300-350 sal in ku li vir in.
- Di nava gund de her çiqasî îro malê modern avabûbin jî berê gund tev şikeft bûn û bi giştî ji bo xwedîkirina pêz û demborîyê dihatin bikaranîn

[28]Pismamê Mala Remo ne û îro jî di Kerboran de wek Mala Axê tên zanîn. Pêşîyê wan Mehmûd e ji eşîra Erebîyan in.
[29] Fermana qirkirinê ku di sala 1915an de di derbarê mesîhîyan de hatî dayîn.
[30] Di vir de zîyaretek heye kû jê re *Zîyareta Şêx Xerîb* tê gotin. Tu kes vî meşayîxî nasnake, lewma navê wî xerîb hatîye danîn. Tu kes nizane bê goristana çi wextîye û Xelîlîyan jî mirî li nav vê goristanê ne veşartine (Eliyê Helokê, 2022). Îhtimal ew e ku ev der jî meşayîxekî mesîhîyan e.

- Di nava gund de mizgefta herî kevin 120 salî ye, yanî nû ye. Xelîla gundê Kerboran ê herî mezin e. Li gor vê mezinahîya xwe goristana gund (Şêx Momina Mirada di nav de veşartîye) biçûk e[31].
- Şatira şûnwarê Sûryanîyan e ku li derdorê bi dehan cihên wiha jîngeh û xelwetxane hebûn[32] û ezîz(ey)ên mesîhî tê de veşartî bûn.

Li gor van agahîyên jor du ihtîmal derdikevin pêşîya me: Îhtîmala pêşî ew e ku dema kurdên misilman hatin Şatira ev ezîzeya mesîhî (Şêx Momina Mirada) ji xwe dihat zanîn, bi navûdeng bû û ji bo xêr û bereketa wê dihat zîyaretkirin. Misilmanan, bi mesîhîyan re yan jî piştî wan kulta vê ezîzeyê dewr sitandin, bi motîfê îslamî guherandin û temelûk kirin. Îhtîmala duyemîn, dema ku misilman hatin heremê, navûdengê vê ezîzeyê bihîstin, pejirandin û çîroka wê li ser keçikeke sêwî û bêyî ku bigihijê miradê xwe ji vê dinyayê koçkirî re munasîb dîtin û pêvedanîn. Yanî kesa di gornê de misilmane lê çîroka wê ya ezîzeyeke mesîhî ye.

### 3.3.2. Delîlên Çîrokî

Di vê binbeşê de em dê delîlê ji çîroka welîbûna Şêx Momina Mirada analîz bikin ku ev dane ji bo îhtîmal û angaşta ezîzetîya Şêx Momina Mirada delîlên resen in. Ji bo têgihiştin û dîyarkirina lêkolînê di serî de divê em hinekî behsa ezîzeyên mesîhîyan û xelwetxaneyên wan bikin. Di xirîstîyanîyê de li gor îslamê di warê dîn de pejirandin û pîrozîya jinê bêhtir xuya ye. Di bawerîya Xirîstîyanîyê de navûdengê Hz. Meryem ewqas zêde ye ku ev navdarî ji pîroz qebûl kirina jinan re bûye bingeh. Lewra Hz. Meryem di bawerîya Xirîstîyanîyê de wek dê, xizmetkar û nazdara Xwedê hatîye dîtin (Alexandre, 2005, r. 407-408). Bawermend û mirîdê Hz. Îsa yên pêşîn bi gelemperî jin bûn ku navên gelekan ji wan îro di incîlê de jî derbas dibe (Alexandre, 2005, r.416). Ji ber van sedeman, gelek alimên mesîhî cudahîya di navbera jin û mÊran de nemunasîb dîtine. Di pêvajoyê de jin jî wek mêran di xelwetxaneyan de ketin xilwetê, xizmetkarîya dêr û xelwetxaneyan kirine, ji bo belavbûna dîn xebitîne. Van jinan bi bawerîyeke saf û qenc, ewqasî xwe feda kirine ku (hin jê hê di

---

[31] Ji bo berawirdkirinê, wêneyên goristanê di pêveka xebatê de ne.

[32] Ji bo agahîyên berfirehtir bnr: Elif Keser Kayaalp, *The Ecclesiastical Architecture of Northern Mesopotamia, 300–800 AD,* Oxford University Press, 2022 herwiha ji bo nexşeyê: www. turkiyekulturvarliklari.hrantdink.org

zindîbûna xwe de) bi gelemperî piştî mirina wan wek ezîze (qedişto) û kesên pîroz hatine qebûl kirin.

Ev ezîze di nav goristanên xelwetxaneyan de ku ji wan re tê gotin *beth qeddîş* (mala ezîzan) di hatin bicihkirin. Ji bo xêr û berekata van ezîzeyan goristan, di rojê dîyarkirî de dihatin zîyaret kirin. Rîtuelên cuda yên dinî li ser van ezîzeyan dihatin pêkanîn ku îro jî dewam dikin. Herwiha ev ezîze ne tenê ji bo Sûryanîyan lê ji bo mezhebê mesîhîyan ên din jî bi awayeke hevpar pîroz dihatin qebûl kirin û zîyaret kirin. Ev ezîzeyên Sûryanîyan di heremê de ewqasî navdarbûn ku ji alîyê metropolît û petrikên mezin ve biqasî Qudsê pîroz û zîyaretkirina wan wek hecê girîng dihat qebûl kirin (Bilge, 2011, r. 519).

Herema Torê ji alîyê piranîya dêr, xilwetxane û kulyên ezîz(ey)an ve gelekî navdar bû ku îro jî wiha ye. Bonimûne xelwetxaneya Mor Gabrîyelê di sala 397an de avabûye û bi giştî ji bo mesîhîyên mezrabotan bûyê navendeke dînî û perwerdehîyê. Di vê herema teng û biçûk de jibilî dêran, biçûk û mezin tev de nêzî 300 xelwetxaneyî hebûn ku îro jî cihê 80yî ji wan dîyar e (Bilge, 2011, r. 520). Helbet jimareya 300 xilwetxaneyî tê wateya ku bi hezaran ezîz(e) di nava wan û derdora wan de veşartîne. Ji bo salvegera mirina van ezîz(ey)an gelek rojê pîroz hatine dîyarkirin û bi şêweyeke dînî tên pîroz kirin. Di bawerîya Sûryanîyan de ji vê rojê re şahro (ܫܗܪܐ)[33] tê gotin ku heta sibehê şîyar dimînin, bi bêdengî dua dikin û qesîde tên gotin.

Piştî van agahîyan êdî em dikarin delîlê xwe pêşnîyar bikin:

- Bi zimanê aramî şahro û bi kurdî zêw di heman wateyê de tên bikaranîn sedema pîrozkirina van rojan, bibîranîna mirina meşayîx (welî) û ezîz(ey)an e. Heta berî 40-50 sal berê ev rojên yad kirinê hem di nav misilmanan de hem jî di nav Sûryanîyan de bi şêweyek kêf û coş dihatin pîroz kirin[34]. Lê îro ew

[33] Wateya wê "nerazan, heya sibehê şîyarmayîn û bi bêdengkî qesîde gotin e".

[34] Ev agahî di hevpeyvînên me de ji alîyê Hemed Eliyê Mala Qaso, Elîyê Neso, Hemedê La'lê û Metran Gabrîyel Akyüz ve hat teyîd kirin. Li ser zêwa Şêx Momina Mirada bi ribabê govend dihat girêdan, jin û mêr bi hev re direqisîn. Li gor bîranînên Hemed Elîyê Mala Qaso, dengbêjê navdar Miradê Kinê bi xwe jî stran gotine û ew li gelek zêwên heremê en cuda wek dengbêj bûye mêvan.

şêwe hem misilmanan hem jî Sûryanîyan terk kirine ku wek guneh tê qebûl kirin. Bi gelemperî ev zêw û şahro di navbera mehên temûz û îlonê dihatin pîrozkirin. Di herema Torê de şahroya herî navdar ya Dêra Haxê ye ku ev dêr gelekî kevnar e û li ser navê Hz. Meryem hatîye çêkirin. Her sal 15ê tebaxê li vê dêrê mirina Hz. Meryem tê pîrozkirin. Her wiha zêwa Şêx Momina Mirada jî her sal 15ê tebaxê li gundê Xelîla tê pîroz kirin. Di nava sê mehan de, ji bo zêwa Şêx Momina Mirada bijartina 15ê tebaxê watedar e û li gor me ev roja hevpar ne tesaduf e.

- Wekî me di beşê jor de jî got, kerameta derxistina fêkî û şînîyên newext taybetmendîyeke pîrozîya Hz. Meryem e ku ev kerameta wê di İncîl û Qur'anê de jî derbas dibe. Şêx Momina Miradan jî ji mêvanê ku hatin wê îmtihan bikin, fêkîyê havînî di demsala zivistanî de derxistîye û mevanên xwe bi xwe dane bawerkirin. Gava ku mirov li motîfê menqebeyên îslamê û bi giştî jî li yê cîhanê di nêre, bi sedan motîf derdikevin pêşberî me. Lê di nav ewqas motîfan de bijartina motîfeke ku koka xwe ji bawerîya xiristîyanîyê digire ne tesadûf e. Lewra li gor me ev nîşana temelûk kirina kulta ezîzeyeke mesîhî ye.
- Di lîteratura mûcîzeyên pêxemberan de fêmkirina armanc, raman û niyta mirovan bi Hz. Îsa re hatîye têkildar kirin. Ev mûcîze di İncîl û Qur'anê bi hevşêweyî derbas dibe û di dîroka tesewwufê de jî bi Xelacê Mensûr ve hatîye têkildar kirin. Lewra Xelacê Mensûr ji ber jiyana wî ya ku dişibe jiyana Hz. Îsa gelek kerametên Hz. Îsa li ser wî jî tên gotin. Bonimûne wî jî niyet û ramanên di serê kesê li dora xwe de xwendine û civata li derdora xwe ecêbmayî hiştine. Şêx Momina Miradan jî li gor çîroka xwe alim û şêxê ku hatin îmtihana wê, di serê hatina wan de nîyet û armanca wan bêyî ku kesek xeber bidayê, eşkere kirîye. Bijartina vê motîfê jî kerametên ezîz(ey)an tîne bîra me.
- Li gor çavderî û daneyên ku me ji sehayê dane hev Şêx Momina Miradan ne ji heremê ye û ne jî seyîd e. Li gor çîroka welîbûna wê ew ji derveyî gund e. Yanî di hişê kolektîf ê gundîyan de ew bîyanî ye. Ew hê di saxîya xwe de ji alîyê gundîyan ve ne hatîye pejirandin lewra ji meşayîxbûn û goristanê re cih nedanê ku di dawîya daxwaza xwe de nifir li wan kirin e. Ev agahî, vê

şîroveyê tîne bîra mirov: Gundîyan bi eslê vê meşayîxe zanîbûn yan jî tê di anîn der ku ew ezîzeyeke mesîhî ye, lewra pêşî ew redkirin lê paşê wek ku ji wan re meşayîxeke ku bi hewara wan ve bigihe pêwîst bû, paşê qebûl kirin. Kulta wê hêdî hêdî guherandin, pejirandin û temelûk kirin.

## ENCAM

Di dîrokê de ji heyamên berê heya îro herema Torê mazuvanîya gelek bawerî, çand û kultên cuda kirîye. Demografîya heremê her çiqasî îro ji alîyê misilmanan zêdebû be jî herem, bawerîyên folklorîk ên mesîhî û êzîdîyan îro jî di nav xwe de dihewîne. Ev bawerîyên îslamî û neîslamî bi teşeyên cuda tevlîhev bûne û di nav jîyana rojane de derdikevin pêşberî me. Heterojenîya dîrokî a heremê, di qada bawerîyê de xwe wek senkretîzmê dîyar dike. Wezîfeya zanistên civakî bêyî pêşbiryarên erenî û neyînî, fêm kirin, xepartin û lê kolandina girîngîya van bawerîyan e.

Di lêkolîna me de em di vê çarçoveyê de li ser kulta meşayîxeke jin (ku îro jî zîyareta wê ji alîyê gel ve tê zîyaretkirin û gelek rîtuel li ser tên kirin) sekinîn. Li gor çavkanîyên dîrokî û motîfên çîroka welîbûna vê meşayîxê, me dît ku di eslê xwe de ew ezîzeyeke mesîhî ye. Helbet ev îhtîmal e, bi lêkolînên berfireh dibe ku agahîyê nû û li gor van agahîyên nû şîrove û raveyên nû bên kirin. Bonimûne dibe ku berîya bawerîya xirîstîyanîyê li heremê belav bibe, ev meşayîx û kulta wê ji koka xwe paganîzmê jî girtibe. Lê çawa jî be, ev nêrîn tekûz e ku li heremê bawerîyên cuda bi hevdû re têkildar in, hevûdû guherandine û bi şêweyeke senkretik hatine heta îro. Di dema têkelbûn û senkretîkbûne de bi qasî ku em zanin li heremê medrese, tekya, şêx û alimên di qada xwe de navdar û pispor kêm in. Lewma bawerî û kultên heremê, hevpar bûne û bêyî ku li rasta astengî û qedexeyan werin, hatine pejirandin. Herwiha helwesta tesewwufê a bêhnfireh û bitehemûl ji bawerîyên heretîk û hevpar re bûye zemîn.

Li gel van şîrove û raveyan dibe ku şert û derfetên wê demê pejirandina kultên hevpar wekî pêdivîyekî derxistibe pêşberî bawermendan. Lewra dema kurdên misilman hatin heremê, hem kêm bûn hem jî dixwestin xwe li wir bigirin. Ji ber wê di vê hevparîyê de îhtimala arezûmendîyê jî di cihê xwe de ye ku em dikarin vê bidilîyê heta serdestîya misilmanan wek sembola aşitîyê bibînin. Çawa ku piştî her koçê, koçber ji bo entegrasyonê pêwîste hinekî ji xwe tawîz bidin û bên pişaftin, niştecihên nû jî pêwîste ji bawerîya xwe hinekî tawîzan bidin.

Di vî warî de xebatên kurdî bi awayeke zanistî û birêkûpêk kêm hatine kirin û qad li benda lêkolînerên xwe ye. Valahiyeke mezin li benda tije kirinê ye. Ji ber vê yekê ev xebata me ya kurt, hêvî ew e ku di warê paşeroja folklorzanîya kurdî de bibe weke çavkanî yan jî bîblografiyekê ji bo vekoler û xebatkaran; bê bikaranîn û bibe sedema vekolînên nû.

## ÇAVKANÎ


Adak, A. (2004). Güneydoğu Anadolu'da Seyidler. *Marife, 4*(3), 365-376.

Alexandre, M. (2005). İlk Hıristiyan Kadınlar. Di nava Duby, G. & Perrot M. (ed.). *Kadınların Tarihi: Ana Tanrıçalardan Hıristiyan Azizelere* (Çev. Fethi, A.). İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları.

Aydın, S. (2022). Tori ve Boti: Dicle'nin Kestiği Coğrafyada Aşiretler ve Aşiret İlişkileri. Di nava Şur, T. & Çakmak Y. (ed.). *Aktör, Müttefik, Şakî* İstanbul: İletişim Yayınları. s. 33-50

Berktay, F. (2012). *Tektanrılı Dinler Karşısında Kadın.* İstanbul: Metis Yayınları.

Bilge, Y. (2011). Turabdin: Süryani Kilise ve Kültürünün Beşiği. *Sempozyûma Navnetewî Ya Midyadê*, Mardîn: Mardin Sesi Gazetecilik ve Matbaacılık. s. 507-526

Bruinessen, M. van. (2005). Adile Hanım'dan Leyla Zana'ya: Kürt Tarihinde Siyasi Liderler Olarak Kadınlar. Di nava Mojab S. (ed.). *Devletsiz Ulusun Kadınları: Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar* (Çev. Adsay, F., Kılıç, S. & Uşaklı, E.). İstanbul: Avesta Yayınları. s. 131-154

Celîl, C. (2020). *13 Rûpelên Balkeş Ji Dîroka Gelê Kurd.* Dîyarbakir: Weşanên Wardoz.

Cirik, M. E. (2019). *Welîyên Kurd Di Nefahatu'l-Unsê de,* (Teza Lîsansa Bilind Neçapkirî), Zanîngeha Mardin Artuklu

Çağrıcı, M. (1994). *Dostluk Maddesi* (Cilt 9). İstanbul: TDV İslam Ansiklopedisi.

Çalışkan, M. (2017). Hucurat Suresi Bağlamında Takva. *Bozok Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*(11), s. 91-119.

Eliade, M. (1999). *Şamanizm.* (Çev. Birkan, İ.) Ankara: İmge Kitabevi.

Erpolat, M. (2007). Tapu-Tahrir Defterlerine Göre 16. Yüzyılda Midyat. Di nava Özcoşar, İ. (ed.). *Makalelerle Mardin 1 (Tarih-Coğrafya)* (s. 381-413). İstanbul.

Galetti, M. (2005). Kürt Toplumunda Kadınların Rolü Üzerine Batılı Tasvirler. Di nava Mojab S. (ed.). *Devletsiz Ulusun Kadınları: Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar* (Çev. Adsay, F., Kılıç, S. & Uşaklı, E.). İstanbul: Avesta Yayınları, s. 283-306.

Gellner, E. (1994). *Postmodernizm, İslam ve Us*. (Çev. Peker, B.) İstanbul: Ümit Yayıncılık.

Goyi, Z. (2020). Kolektif Kültürel Eğlencenin Antropolojisi: Kürdistan'da Kolektif Kültürel Eğlence, Modernizm ve İslamla Çatışmalar. *Kürd Araştırmaları*(3), s. 205-254.

Güneş, H. (2011). İslamlaşma Sürecinde Midyat. *Sempozyûma Navnetewî Ya Midyadê* (). Mardin: Mardin Sesi Gazetecilik ve Matbaacılık, s. 67-90.

Hosseini, Z. M. (2017). Adalet, Eşitlik ve Müslüman Aile Hukuku: Yeni Fikirler, Yeni Beklentiler. *Felsefelogos*(67), s. 49-72.

İnevi, N. K. (2019). *Keramet Motifi Üzerine Bir Araştırma.* (Teza Doktorayê Neçapkirî), Zanîngeha Suleyman Demîrel.

Kara, M. (1992). *Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Karakaş, R. (2020). *Güneydoğu Anadolu Halk İnanışları (Dicle Bölümü).* Ankara: Gazi Kitapevi.

Karamustafa, A. T. (2017). *Tasavvufun Oluşumu.* (Çev. Doğan, N.) İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.

Koca, F. (2001). *İstinbat* (Cilt 23). İstanbul: TDV İslam Ansiklopedisi.

Kreyenbroek, P. G. (2013). *Ezidilik: Arka Planı, Dini Adetleri ve Metinsel Geleneği.* İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.

Lings, M. (1986). *Tasavvuf Nedir?* İstanbul: Akabe Yayınları.

Nikitin, B. (1991). *Kürtler: Sosyolojik ve Tarihi İnceleme.* (Çev. Süreya, C. & Demirhan, H.) İstanbul: Deng Yayınları.

Ocak, A. Y. (1992). *Kültür Tarihi Kaynağı Olarak Menâkıbnâmeler: Metodolojik Bir Yaklaşım.* Ankara: Türk Tarih Kurumu Basımevi.

-----------------(2002). *Alevi ve Bektaşi İnançlarının İslam Öncesi Temelleri.* İstanbul: İletişim Yayınları.

-----------------(2021a). *Tasavvuf, Velayet ve Kainatın Görünmez Yöneticileri: Tarihsel, Sosyolojik ve Eleştirel Bir Yaklaşım.* İstanbul: Alfa Yayınları.

-----------------(2021b). *Osmanlı İmparatorluğu ve İslam: Bir İmparatorluk Bir Din.* İstanbul: Alfa Basım ve Yayım.

Öngören, R. (2009). *Sûfî* (Cilt 37). İstanbul: TDV İslam Ansiklopedisi.

Öztürk, M. (2012). *Cahiliyeden İslamiyet'e Kadın.* Ankara: Ankara Okulu Basım Yayın.

Rûhanî, B. M. (2020). *Dîroka Navdarên Kurd* (Cilt 1). (Çev. Irgat, M. & Kılıçarslan, İ.) İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Rûhanî, B. M. (2020). *Dîroka Navdarên Kurd* (Cilt 2). (Çev. Irgat, M. & Kılıçarslan, Î.) İstanbul: Nûbihar Yayınları. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Schimmel, A. (2011). *Ruhum Bir Kadındır* (3 b.). (Çev. Akbulut, Ö. E.) İstanbul: İz Yayıncılık.

Smith, M. (2016). *Rabia: Bir Kadin Sufî* (5 b.). (Çev. Eraydın, Ö.) İstanbul: İnsan Yayınları.

Su, S. (2009). *Hurafeler ve Mitler: Halk İslamında Senkretizm.* İstanbul: İletişim Yayınları.

Tan, A. (2011). *Turabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kültürler.* İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Taş, S., & Kaval, Y. (2020). Tunceli'de Kültürel Sembol: Dağ Keçisi. *Motif Akademi Halkbilimi Dergisi, 13*(30), s. 680-688.

Topaloğlu, B. (2004). *İslam'da Kadın.* İstanbul: Ensar Neşriyat.

Tosun, N. (2009). *TDV İslam Ansiklopedisi* (Cilt 37). İstanbul.

Yalçınkaya, F. (2008). *Muş'ta Yatırlar ve Yatırlarla İlgili Anlatılan Menkıbeler.* (Teza Mester e Ya Neçapkirî) Zaningeha Yuzuncu Yılê.

Yalçınkaya, F. (2019). Anadolu Efsanelerinde Kadın ve Çocukların Kuşa Dönüşmesi Motifi. *Motif Akademi Halkbilimi Dergisi, 12*(28), s. 945-955.

Yıldırım, K. (2018). *Kürt Medreseleri ve Alimleri* (Cilt 1). İstanbul: Avesta Yayınları.

Zerrînkûb, A. (2017). *Sûfî Mirasının Değeri.* İstanbul: Visal Yayınları.

**ÇAVKANÎYÊN DİJİTAL**

İncil-Tevrat-Zebur: Kutsal Kitap. (2022, 06 20). *İncil*. https://www.incil.info/ adresinden alındı

Meala Qur'anê. (2022, 06 21). https://www.kuranmeali.com/index.php adresinden alındı

**ÇAVKANÎYÊN DEVKÎ**

- Bihara Xelîlî (Dîrok: 13.05.2022, Temen: 58, Cihê Hevpeyvînê: Kerboran)
- Eyşa Xelîlî (Dîrok: 14.05.2022, Temen: 64, Cihê Hevpeyvînê: Kerboran)
- Gozela Xelîlî (Dîrok: 19.04.2022, Temen: 67, Cihê Hevpeyvînê: Kerboran)
- Menîca Helokê (Dîrok: 17.04.2022, Temen: 83, Cihê Hevpeyvînê: Xelîla)
- Hemed Elîyê Mala Qaso (Dîrok: 16.04.2022, Temen: 78, Cihê Hevpeyvînê: Xelîla)
- Mele Evdile Kurdî (Dîrok: 17.04.2022, Temen: 52, Cihê Hevpeyvînê: Xelîla)
- Quryaqos Ergün - Serokê Weqfa Dêr Emerê (Dîrok: 11.05.2022, Temen: 52 Cihe Hevpeyvîne: Midyad)
- Gabrîyel Akyüz – Pîskopos (Dîrok: 20.05.2020, Temen: 63, Cihê Hevpeyvînê: Li Ser Înternetê)

- Elîyê Neso (Dîrok: 17.04.2022, Temen: 85, Cihê Hevpeyvînê: Xelîla)
- Hemedê La’lê (Dîrok: 19.04.2022, Temen: 73, Cihê Hevpeyvînê: Kerboran)

## Pêvek 1: Wêneyên ji Gund û Meşayîxê Şêx Momina Mirada



**Wêne 1:** Ji dûr ve gundê Xelîla



**Wêne 2:** Ji dûr ve meşayîxê Şêx Momina Mirada û Gundê Xelîla



**Wêne 3:** Ji jor ve gorna Şêx Momina Mirada



**Wêne 4:** Ji dûr û erdê ve gorna Şêx Momina Mirada



**Wêne 5:** Ji nêz ve gorna Şêx Momina Mirada û Seydayê Mele Evdilhekîm



**Wenê 6:** Ji nêz ve kêla ber serê Şêx Momina Mirada Û Seydayê Mele Evdilhekîm



**Wêne 7:** Şikefta (Mala Wê) Şêx Momina Mirada




**Wêne 8:** Nava şikefta Şêx Momina Mirada



**Wêne 9:** Hicrika meşayîxê Şêx Momina Mirada



**Wêne 10:** Ji bo kesê ku li ser meşayîx qurbana serjê bikin û xwarinê çebikin cihe firaxa



**Wêne 11:** Hûndirê hicrika meşayîx



**Wêne 12:** Gornên li nav meşayîx



**Wêne 13:** Beroş û qûşxaneyên ji bo çêkirina xwarinê



**Wêne 14:** Tifikên ji bo çêkirina xwarinê



**Wêne 15:** Tenûra ji bo çêkirina nên